Roger Lescot

# Çiyayê Kurmênc û Tevgera Murûdan

Weşanên Komela Jinên Kurdistanê li Swêdê

Paris, 18 Tirmeh
Mamo Cûmî

Roger LESCOT

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# Le Kurd Dagh
# Et
# Le Mouvement Mouroud

# ÇIYAYÊ KURMÊNC
# Û
# TEVGERA MURÛDAN

Traduit et annoté par / Wergerandin û perawêznivîsîna
**AMED**

Revu par / Lênêrîna
**ZÎNÊ**

Editions de l'Association des Femmes du Kurdistan en Suéde
Weşanên Komela Jinên Kurdistanê Li Swêdê
1993

Çapa yekê: 1993 Stockholm

ISBN: 91-971832-1-0

© Komela Jinên Kurdistanê li Swêdê

**Navnîşan:**
Box: 7007
171 07 SOLNA
SWEDEN

## SERECEM

## ÇIYAYÊ KURMÊNC Û TEVGERA MURÛDAN


Rûpel

**I- Nexşa Çiyayê Kurmênc** 5

**II- Gotinek** 6

**III- Pêşgotin** 13

1- Hatinêd Çiyayê Kurmênc
2- Şênbûna Çiyayê Kurmênc
3- Dîroka Çiyayê Kurmênc

**IV- Durvêd siyasî yêd Çiyayê Kurmênc** 21

1- Bingehê siyasî yê Çiyayê Kurmênc

2- Pirsa olî
3- Pirsa civakî :
a- Nîzama hebûnê
b- Kontra

**V- Destpêka Murûdîtiyê li Çiyayê Kurmênc** 28

1- Kokêd Murûdîtiyê
2- Dûrvêd olî yêd Murûdîtiyê
3- Murûdîtî û pirsa civakî

**VI- Durvê siyasî yê Murûdîtiyê** 36

1- Murûdîtî û siyaseta deverîn
2- Peywendiyêd Murûdan bi Tirkan re

**VII- Dîroka Mûrûdîtiyê li Çiyayê Kurmênc** 44

1- 1933- 1938
2- Şibata 1938 - adara 1939
3- Piştî adara 1939

**VIII- Paşgotin** 50

**IX- Paşkok** - Hozêd Çiyayê Kurmênc 53

1- Şikakan
2- Amkan
3- Biyan, an Ocaq Izedîn
4- Şêxan
5- Cûmiyan
6- Rûbariyan
7- Xerzan
8- Heştiyan
9- Xastiyan

**X- Endêks** 71

# II- GOTINEK

## 1 - Çend gotin li ser berhem û jiyana Rojê LÊSKO :

Rojê LÊSKO (Roger Lescot) ê ku li sala 1914-an hatî dinê, yek ji rohilatnas û kurdnasêd Firansiz êd bi nav û deng e. Piştî ku xwendina wêjeya Firansizî û zanînêd siyasî di sala 1936-an de li Ekola Netewî ya Zimanêd Saẍ yêd Rohilat (niha Amûjgeha Netewî ya Ziman û Şaristaniyêd Rohilat /INaLCO) - Zanîngeha Parîsê (III), kuta dike, hukmeta Firansiz wî dişîne Amûjgeha Firansizî li Şamê. Li Şamê, R. Lêsko Celadet Bedir-Xan nas dike. Pê re, camêr bayixiyê dide wêje, ziman û folklorê kurdî. Di van waran de pirr berheman amede dike. Emê niha wan li jêr nîşan din.

Salekê berê ku hukmeta Firansizî destê xwe ji Şûriyê bikşîne, Rojê Lêsko tê kursiyekê dersdayînê li Ekola Netewî ya Zimanêd Saẍ yêd Rohilat - zanîngeha Sorbonê, li sala 1945, ve dike û dersêd kurdî dide. Pê re, Mîr Kamuran Bedir-Xan tê ciyê wî digre. Ji aliyê xwe de, ew jî dibe dîplomatê hukmeta Firansa û li destpêka salêd 60 wî li Urdunê û Bangkokê dikine balyozê dewłetê. Pirr dirêj nake, nexweşiyek bi wî dikeve û di sala 1975-an de çavêd xwe dide hev.

Ji bilî berhemêd li ser miletêd dinê, êd bi kurdî ku Rojê Lêsko çap kirine û yêd ku çap ne bûne ev in :

- *Textes kurdes, contes, proverbes et énigmes* (deqêd kurdî, çîrok, metelok û têderxistinok), perçê yekê, Institut français de Damas, Collection des textes orientaux, Pirtûkxana Rohilatnasiyê Paul Geuthner, Parîs, 1940, 258 rûpel.

- *Textes kurdes, Memê Alan*, (deqêd kurdî, Memê Alan), perçê dudiyê, Institut français de Damas, Collection des textes orientaux, tome I, Bêrût, 1942, 385 rûpel.

- *Proverbes et énigme kurdes* (metelok û têderxistinokêd kurdî), ji *Etudes Islamiques*, sal 1937, Cahier IV, hatiye girtin, Pirtûkxana Rohilatnasiyê Paul Geuthner, Parîs, 1937, rûpel 307-351.



INSTITUT KURDE de PARIS

- *Enquête sur les Yézidis de Syrie et du Djabal Sindjâr* (Lêkolînek li ser Ezdiyêd Sûriyê û Çiyayê Şengalê), Mémoire de l'Institut français de Damas, Bêrût, 1938, 280 rûpel.

- BEDIR KHAN, Emir Djeladet et LESCOT, Roger : *Grammaire kurde (dialecte kurmandji)* {Rêzimana kurdî - zaravayê kurmancî}, Çapxana Orientaliste, s.p.r.l., Louvain (Belgique), 1970, 372 rûpel.

- *Eşîrêd Kurdistanê*, çap ne bûye (li gor Azadî (Parîs), kopiyeka gotarê li ba me heye, lê em hejmara kovarê nizanin).

- *Çend efsaneyêd Kurdî*, çap ne bûye (li gor Azadî (Parîs), kopiyeka gotarê li ba me heye, lê em hejmara kovarê nizanin).

Ev lêkolîna ku me ji Firansizî wergerandiye kurdî jî yek ji van karêd Rojê Lêsko ye ku ne hatiye çap kirin. Berî ku ew di *Studia Kurdica* de, kovara Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, hejmar 1-5, Parîs, 1988, rûpel 101-125, bihata belav kirin, destnivîsa vê lêkolînê keti bû destê me. Em vê xalê diyar dikin ji ber ku *Studia Kurdica* belavkirina wê di hin deran de ħerimandiye. Di hin cina de, deqin belav ne kirine û di hina dinê de bala xwe ne dane navêd gundan û xa-

lên dinê yêd girîng. Her wisa, wergerandina ku me kirî ji destnivîsê ye û xalêd ku di *Studia Kurdica* de hatine ne wekî destnivîsa wê ne, me nîşan kirine. Paşê, Rojê Lêsko nexşek li gora nexşa kaptêd Daniau ji Çiyayê Kurmênc re bi destê xwe çê kiri bû, ew jî belav ne bûye.

## 2 - Çend gotin derbarê lêkolînê de :

Berî em van çend gotina bikin, pêşî em dixwazin diyar kin ku lêkolîneka wiha li ser Murûdan bi zimanê Erebî, ji aliyê avokat 'Usmet de, ji gundê Şorbe, Çiyayê Kurmênc, di *Dîrasat Îştirakiya* (Lêkolînêd sosyalîst) de, kovara Partiya Komonîst a Sûriyê - Begdaş, di nîvê salêd 80 de hati bû belav kirin. Pirr me xwest ku em hejmara wê kovarê bi dest xwe xînin da ku em beramberkirineka fireh di navbera herdu lêkolîna de çê bikin, lê me nikarî ew ji welêt bida peyda kirin.

'Usmetê Şorbe ku niha endamê Komîta Navendî ya Partiya Komonîst a Sûriyê ye, bi nêrîneka dinê Tevgera Murûdan dibîne. Sala 1985, me 'Usmet û kalemêrê ku 'Usmet agahdarî jê wergirtinî bi xwe dîtin û em li ser vê meselê rawestîn. Ew ka-

lemêra jî ji mala Şêx Îsmayîlê Zade ye, yek ji mezinêd Murûdan bû. Herwekî li nava şêniyê Çiyayê Kurmênc tê gotin ku Şêx Îbrahîm Xelîl, serê [1] Tevgera Murûdan, casûsê Tirkan bû, bersiva 'Usmet û wî kalemêrî wekî tê bîra me ev bû : "Ev gotinêd hane milet ji devê axayêd Kurdan ku xwe bi Firansizan ve girêda bûn wergirtine. Şêx Îbrahîm nas e ku kî ye û destê Tirkan di Tevgera Murûdan de tune bû. Tevger bi xwe li dijî axayêd Kurdan û dagîrkerêd Firansiz derket, hwd...".

Her çi dîtina me be, em dikarin li ser du xalan rawestin : siyasî û zanistî.

**a- Siyasî** : Firansiz bi qasî mûyekî ne bi hebûna dewleteka Kurdî re bûn. Berjewendiyêd Firansa, wê demê, dixwestin ku Kurdan di destê xwe de bikin kertek û li ser serê Kemalîstan bidin lîskandin da ku evêd dawîn pirr berve Dewleta Bolşevîkan neşiqtînin. Hebûn û avabûna dewleta Kemalîstan jî ra niha ji siyaseta wan a gurikî [2] de berdewam bûye. Eynî vê siyasetê hîşt ku Firansiz Hetay (Iskenderon) bi ser Tirkiyê de berdin, da ku Tirk xwe ne din aliyê Almanan. Wekî em dibînin Rojê Lêsko gelekî ji

[1] Ser : serok, mezin.
[2] Gurikî : bi Erebî "tufeylî", bi Firansizî "parasite".

Kurdan ḧez kiriye û xebatêd ku li ser Kurdan jî kirine xebatina bê nimûne ne. Eger mirov lêkolîna wî bi hûrî bixwîne mirov tê digihê ku camêr dizane çawa Kurd ji berjewendiyêd hêzêd navçeyî û cîhanî re bûbûne ardû. Ji ber vê carina camêr di derina de bernavê "on" bi Firansizî bi kar aniye. Wataya vî bernavî carina tarî ye; mirov nizane kê dixwaze nîşan ke. Bi kurdî wataya vî bernavî nêzîkî "mera, mirov, meriv" e.

**b- Zanistî** : lêkolîna Rojê Lêsko ji aliyê agehdariyan de li ser navçê pirr zengîn e û dîroka wê baş hatiye diyar kirin. Bi gotineka dinê, eger em warê dîrokî, aborî û erdnasî bigrin, lêkolîn gelekî hêja ye û Rojê Lêsko mafê wê bi kûrahî daye. Girîngiya vê lêkolînê di vir de ye ku agehdariyêd ku Rojê Lêsko kom kirine ji aliyê şêniyê Çiyayê Kurmênc bi xwe de hatine ji bîr kirin. Bi gotineka dinê, camêr dîroka vê navçê ji tarîkirina ku bi serê dîroka Kurdan tê, parast.

Gotina dawî em dixwazin li ser nexşa ku R. Lêsko bi dest çê kirî bikin. Ji ber mezinbûna nexşê, me nikarî hemî navêd gundan dernaniya. Wekî dinê,

me çêtir dît ku em ji her hozekê [1] û deverekê navêd bajar û çend gunda deynin.

Parîs, 07.10.1989

[1] Divê em diyar kin ku niha yekcar hoz (êl) li Çiyayê Kurmênc ne mane. Peywendiyêd hozane tev de hatine tixandin.

# III- PÊŞGOTIN

Zincîra Çiyayê Kurmênc ku bi sîstema Torosê ve girêdayî ye, ji bakur-rohilat dirêj dibe başûr-rohilat. Başûrê vê zincîrê Geliyê Efrîn e [1]. Tenha dawiya wê ya başûrî dikeve nav axa Sûriyê.

Kurdax an Cebel el-Ekrad [2], roavayê wî Geliyê Qereso ye, rohilatê wî Deşta Ezazê ye, başûrê wî Efrîn e, bakurê wî sînor e. Sînorê bakur ji Meydan Ekbesê destpê dibe û diçe digihê Kilisê. Çiyayê Kurmênc rêzek e ji çiya û newalan. Bilindahiya wî ya navîn ji 700 ra 1200 mitr e, tevde geliyêd kûr û teng in, ji başûr-roava ve vedibe û berve bakur-rohilat diçe. Di navbera wan de derbasbûn zehmet e. Tenê korta Reco û Efrînê ku ji roava diçe rohilat, rêya hêsin tê de ve dibe, ew jî rêya ku xeta tirênê tê re diçe ye.

---

[1] Cûm - wergêr.
[2] Bi zimanê Erebî wisa tê gotin - wergêr.

Çiyayê Kurmênc nêzîkî deryayê ye û î avî ye. Gelek kaniyêd wî hene, girîngtirîna wan Çemê Efrîn e. Keskahiya Çiyayê Kurmênc mîna a welatêd li ber derya Sipî ne : mêşeka pirr siq çiyan digre, geliyêd wê yêd germ û bê ba ji gênim, ceh, nîskan, nokan..., şînkahî û darêd fêkiyê re dibin.

Heyam ji saxiya mirov re pirr î pak e, havînêd wê pirr germ in û zivistanêd wê jî pirr bi berf û baran in.

## 1- Hatinêd Çiyayê Kurmênc [1] :

Serektirîn hatinêd Çiyayê Kurmênc êd çandinî di geliyan de genim e, ceh e, nîsk in, û li van salêd dawîn tutûn jî hate çandin [2]. Rêjî li vê paşiyê çandina tutûnê xiste qanûnê. Li ser pişta giran, şêniyê Çiyê darêd fêkî (wekî hinar, zêtûn [3], sêv û hwd..) û mêwan [4] diçînin. Îro, daristan ji fêdegirtinê pirr tê pandin,

1 Hatin : mal, dar û berêd ku ji deverekê tên.
2 Niha ne nîsk, ne genim, ne ceh wekî berê pirr nayên e çandin. Herwekî Çiyayê Kumênc navçeka avî ye, milet berê xwe bêtir daye darêd zêtûna, hinara, fêkiya û keskayiyê - wergêr.
3 Di nava 1926 û 1939-an de, 591 944 darêd zêtûnê hatine çandin.
4 Li Çiyayê Kurmênc 2 768 355 mêw hene. Berên mêwa li Çiyê bi xwe tê çê kirin.

berê gelek komir jê dihate girtin û dişandine Ḧelebê [1]. Xudankirina dewaran jî ciyekî girîng distîne, nemaze piyê bakur-roava yê Çiyê pirr kêm ji çandiniyê re dibe. Ji dewaran, êd pirr mî û bizin in, çêl pirr hindik in [2].

Pîşe, li Çiyê mirov dikare bêje hema nîne. Wekî dinê, jin, li zivistanê, gelek kilîmêd [3] fodil êd rengxweş çê dikin. Bi tevahî, şênî li wir ji xwe re bi kar tîne [4].

## 2- Şênbûna Çiyayê Kurmênc :

Navçe seranser Kurd tê de rûniştine, loma navçe bi Kurdan hatiye nav kirin. Şêniyê wê bi pergalêd xwe yêd fîzîk û manawî, bi gelemperî, pergalêd hemwelatiyêd xwe yêd bakur dikşînin [5]. Lê dîsa, têkarkirina hevsiyêd xwe yêd Ereb û Tirk li ser wan heye. Sinçiyêd wan, bergêd wan, mejiyê wan bi mejiyê wan tesîr bû ye. Di zaravayê wan ê ku gelekî herimî bûyî de, pareka xurt ji gotin û hevokêd Tirkî tê de heye.

---

1 Çêkirina komirê bi carekê rabûye - wergêr.
2 Xwedîkirina dewaran ne mîna berê ye, sivik bûye - wergêr.
3 Cil, xalî, berr ? - wergêr.
4 Ev deqê bi du rêzan di çapa eslî de heye, lê di *Studia Kurdica* de ne hatiye belav kirin - wergêr.
5 Pergal : kerekter, şexsiye.

Dîroka rûniştina Kurdan li vî Çiyayî pirr zor e were diyar kirin. Wekî dinê, mirov dikare bigihîne demeka pirr kevin. Di kronîka sedê XVI de, *Şerefname* xuya dike ku yekî ji Menda [1], di destpêka sedê XIII de, mîrekî êrgan [2] navê wî Ķûseyrê Entakiya, aniye ba xwe. *Şerefname* dibêje ku Êzdiyêd navçê û "Kurdêd Cûmê (Geliyê navîn ê Êfrîn) û yêd Kilisê" hevalbendî bi wî mîrî re girêdan. Em tiştekî li ser hozêd [3] ku hîngê li navçê rûdiniştin nizanin, wekî dinê dibe şênbûna Çiyayê Kurmênc ji hîngê de ji binî de hati be guhartin. A rast, ḧemî şênbûnêd vê gavê, ji bilî şênbûna Cûmê, diyar e ji nêzîk de çê bûne û bîranînêd navçê hên li ba wan teze ne. Şêxan ji navça Bîrecikê hatine, Şikakî ji Kurdistana Rohilat hatine (Şêxanêd Gola Wanê binêrin), Biyan şax̂ek in ji Reşwanan, êla ku li başûrê Meletiyayê (Kurdistana Bakur) rûdine, Etmankan ji Dêrsimê hatine, hên parek jê bi vî navî li wir heye. Êzdî jî pirraniya malbatêd wan ji pirr êlêd cihê hatine (Xalitan, Şerqiyan, Dawûdî, û hwd.). Ew di nava sedê XVII û XIX hatine Sûriyê.

---

1 Ji bo çespandina hebûna Mendan li Çiyayê Kurmênc, metelokek li Çiyê bi wî navî, ra niha, bi kar tê. Gava yekî ciyê xwe yî mezin be, paşê, bikeve, jê re dibêjin : "Mendo, kes na bêje kerê te bi çendo"; ango, paşî ket, kesekî xwe lê ne kire xudan - wergêr.
2 Êrgan : kesekî êrgan ango hên jin ne aniye.
3 Hoz : Êl, eşîr.

Niha pênc hozêd mezin li navça Çiyayê Kurmênc rûdinin. Li başûr, Cûmî ne; li rohilat, Şikakî ne; li roava, Amkan û Şêxan in; li bakur, Biyan in. Di paşkokê de, emê têbîniyêd fireh li ser van hozan yek bi yek bibînin. Êzdî ku berê hindikahiyeka pirr girîng bûn û serokêd wan rolekî wan î gewre di siyaseta deverê de hebû [1], îro xwe bi Cûmiyan û Şikakan ve girêdane.

## 3- Dîroka Çiyayê Kurmênc :

Neviyêd Mend, mîrê yekê yê Kilisê û Çiyayê Kurmênc, tim î li ser têxt bû ra [2] zepkirina Sûriyê ji aliyê Sultan Selîmê Yekê de. Hîngê, Mendan bi destê vî sultanî ketine bin fermandariya serokekî Êzdî, navê wî Îzedîn bû. Dema Sulêmanê Gewre hate ser têxt, dîsa Mendan dar standin, çima ku Şêx Îzedîn mir bêyî ku kurekî li pê xwe bihêle. Çaxa ku Osmaniya mîrîtiyêd xwe tev bi xwe ve xurt girêdan, ev mîrîtiya hanê jî zûka bi pêlangêd xwe bi dawî anî. Li sedê XVII, ciyê mîrê dawî hakimekî girt, î Kurd bû, ji êla Berwariya bû.

---

1 Li sedê XVII, serekê wan ji balyozê Firansizî re, Nointel, ku ji bo demekê hati bû Helebê, pêşniyar kir hevalbendiyê bi Paşayê Firansa re deyne da ku li dijî Tirkan şer bikin .

2 Ra : heta, ta.



INSTITUT KURDE de PARIS - BIBLIOTHÈQUE

Va Kurdê ha yî gewre bapîrê Rûbariyan e ku ra roja îro li navçê dijîn (li paşkokê binêrin). Neviyêd wî ku Kela Basûtê dagirti bûn karê xwe kirin ku di Geliyê Efrîn [1] de serbixwe bibin. Paşî sedekî, Gêncan ew ji ciyê wan î xurt li mêjûya 1150 koçerî avêtin. Piştî vê serketinê, nûhatiyêd ku koka wan Tirk bûn [2], ango Gêncan, destêd xwe avêtin ser navçê. Piştî raperîna Betal Axayê Gênc ku hukmetê bi erdê ve

1 Cûmê - wergêr.

2 "Ji Gênc Axa kurrek bû, navê wî 'Um Axa. Ji 'Um Axa sê law bûn : Gênc Axa, Betal Axa û Omer Axa. E ku serhildan li Kela Basûtê li dijî Tirkan çê kirî Betal Axa bû. Jê re digotin Betal Axayê Milî ji ber ku ji hoza Miliyan bû. Gava Îbrahîm Paşa, lawê Mihemed Elî Paşa, Sûriyê ve kirî, Betal Axa serê xwe ji bo mesela vêrgiyê jê re danenî. Îbrahîm Paşa bi xiniztî karî Betal Axa gêr kira. Sala 1820, ew û lawê wî, Ibiş Axa, vexwendine Kela Helebê (ciyê ku Îbrahîm Paşa lê rûdiniştî) û roya dinê her du bi darda kirin. Gorêd wan ra niha li Helebê ne. Bi navê wan li Helebê kolanek hatiye nav kirin, jê re dibêjin "Axa yol", ango, "rêya axan". Gênc Axa ji Qonyayê hat û li Çiyayê Kurmênc rûnişt. Ji koka xwe de, mala Gênc Axa Kurdina Ezdî bûn (Rohilatnasê navdar Bazîl Nîkîtîn jî di pirtûka xwe, *Les Kurdes, études sociologique et historique*, Weşanêd Aujourd'hui, Parîs, 1959, rûpel 235, çêra Ezdiyêd derdorêd Konyayê dike - wergêr), ra niha merivêd wan li derdorêd Ruhayê dimînin û hên jî Ezdî mane, lê evêd Çiyayê Kurmênc Musulman bûne. Parek ji wê malbatê, niha li Zaxo dimînin, jê re dibêjin mala 'Umo. Gundê Basûtê niha di warê geştevaniyê de nav daye. Navê vî gundî ji gotina "Beyazîdê" hatiye, ji ber ku mala ku berî Gêncan hukum li gund dikirinî ji Deşta Beyazîdê bûn, Ezdî bûn, jê re digotin Mala Çapo û Mala Hemşo", van agehdarîne me ji devê yekî ji neviyêd Betal Axa wergitine. Li gor vî camêrî jî, Tirkkirina malbata wan ji aliyê Mala Şêx Îsmayîl Zade de ji Rojê Lêsko re belkî hatibe gotin, çima berberî di navbera her du seriyan de hebû.

dûz kir, tenê li dora sala 1820 hukmetê kari bû Cûmiyan bixe bin destê xwe.

Mêjûya êlêd bakurê Çiyayê Kurmênc ji gelek şerêd di navbera Şêxan û Biyan de tê pê. Şikakan û Amkan qelstir bûn, xwe ji van berberiyan bi dûr dixistin. Şerê wan ê dawî di sala 1850 çê bû û Şêxan tê de vexwarin [1].

Ji sala 1850 ra sala 1918 kok rûdawekî girîng li Çiyê çê ne bû. Çend şerêd biçûk jê der xînin, dagirtina herêmê ji aliyê Firansizan de bê çetinahîna mezin, çê bû. Şikakan û Ezdiyan tavilê xwe sipartin. Ezdiyan hên partîzanin jî dan û di dagirtina navçê de jî alîkarî kirin [2]. Piştî hinek dudiliya, Kor Reşîdê Biyan [3] destê xwe da rêjîma nû. Di sala 1920 de jî,

---

1 Vexwarin : serketin.

2 Gotina R. Lêsko rastiyekê diyar dike ku çawa olan Kurd ji hev perçe kiri bûn. Kurdêd Ezdî ji aliyê Kurdêd Musulman de ra berî hestiyê netewayetî gelekî hatine êşandin ji ber ku gunehêd wan ne "Musulman" bûn. Vê êşandina hanê pirr caran dihîşt ku liv û helwestêd Kurdêd Ezdî ji Kurdêd Musulman cihê bin, çima ku bindestiya ji Kurdêd Musulman re û ji a biyaniyêd Musulman re wekî hev bû. Di vî warî, bûyer û nimûne gelek in.

3 Kor Reşîd yek ji axayêd Çiyayê Kurmênc e ku bi miletê xwe re xiniz der ketiye. Dema serhildana Şêx Se'îdê Pîran, gerek bû pireyêd li ser rêya hêsin, wekî a Heşargê, werine hilweşandin ji bo alîkarî ji Kemalîstan re ne çe. Mixabin, Kor Reşîd, wekî tê gotin, bi "tenekak zêr" milet firot. Pirr ne dûr e ku ev kirêd hane bi destê Firansizan dibûn da ku Kemalîst bigihêjine armancêd xwe. Pirrekêd mîna Kor Reşîd li Kûbaniyê û li Cizîrê jî rûreşê miletê xwe der ketin. Em dixwazin meseleka dinê jî li ser

Şêxan û Cûmiyan dane pê wî. Çend sal ne çûn, di wê navê de çetayêd çekdar serê milet êşandin. Paşê, li Çiyayê Kurmênc aştî peyda bû ra destpêka çalakiyêd Murûdan (1935-36).

---

Kor Reşîd hewal din. Herwekî Kor Reşîd di destê Firansizan de bû, evêd dawî berî ku ji Sûriyê bikşên, ji Kor Reşîd re pêşniyar kirin ku dibistana bi zimanê kurdî li Çiyê ve kin, lê xinizî qebûl ne kir - wergêr.

# IV- DURVÊD SIYASÎ Û CIVAKÎ YÊD ÇIYAYÊ KURMÊNC

## 1- Bingeha siyasî ya Çiyayê Kurmênc :

Li sedê XIX, li Çiyayê Kurmênc, wekî li Kurdistana Bakur, guhartinêd siyasî yêd kûr çê bûn. Xurtbûna ḧukmê merkezî û rakirina mîrîtiyêd serbixwe yêd deverîn tavilê hilanîna serokêd kevin û çêbûna erîstokrasiyeka nû ji maldarêd xwedî erdan bi xwe re anî. Ji malêd kevin êd li Çiyê tenha mala Gênc û Rûbariyan jê mane. Malêd dinê (mala Ḧec Omerê Biyan, mala Caferê Şêxan û hwd.) tev vemirîn, an li ser rêya çûnê ne. Xanedanêd serekîn ji malbatêd ku giraniya wan li vê dawiyê henî ne û bi destxistina erdan zengîn bûne ev in : mala Şêx Îsmayîl Zade, mala Dîko, mala Reş Aẍa, mala Se'îdê Mamo û hwd. Van serokêd nû xurtiya xwe ji heyîna wan a xweş hatiye, ne ji hêza çekdar a girûpêd partîzan hatiye. Ev yeka hanê, durvekî siyasî yî cihê, ne mîna civakêd dinê yêd Kurdî, daye Çiyê.

Mirov li pûçbûna pirr a peywendiyêd êlan di civaka Çiyayê Kurmênc de mat dimîne. Berî niha kêmî sedekî, şênbûnêd wekî yêd Biyan û Şêxan pirr

li ser hev bûn û xurt bûn ku şerî hev bikin. Vê gavê, ew li ser rêya wendabûnê ne. Bi carekê, hevgirtinek di navbera xelkêd wan de nîne. Nema êdî ew xwe "xelkê êlê" dibînin û bûne gundîna sade, tenê bi baẍçêd xwe ve girêdayî ne. Hew êdî kesek xwe dibîne ku gerek e vêrgiyê bide, ne ji ḧukmetê re, ne ji serokêd xwe re. Li serê dinê jî, xanedanêd Çiyê, xwediyêd erdan êd ku her tim berberiya berjewendiyan di navbera wan û hevsî û cotkaran de heye, xwe kok wekî derebegêd Kurdêd kevin na bînin, derebegêd ku hest dikirin ew serokêd wan in û mafêd wan li ser peyayêd xwe hene. Xwedê-giravî Aẍayêd Çiyayê Kurmênc pişta xwe nikarin bi dilsoziya cotkarêd xwe ve girêdin. Giraniya wan nîne eger heyîna wan tune be, tu kes guhê xwe na de wan eger erd ne erdê wan be, an ji wan hati be kirê kirin.

Navçêd desthelatdariyê, vêca, kok mîna berê li gor êlan ne mane. Wiha, mala Şêx Îsmayîl Zade xwe serekê Biyan dibînin, lê parek ji êla wan ji bin destê wan der ketiye. Wekî dinê, gelek gundêd Şikaka û Âmkan ku erdê wan lê hene, di bin destê wan de ne. Ê Men'an Niyazî, serokê navî yê Şikaka, desthelatdariya xwe li ser êla xwe nîne, çima ku pirraniya erdêd xwe li navça Ereban, li Ezazê, dikevin. Rewşa Ḧusên Ewnî jî li nik Şêxan mîna wî ye. Dawî, li kêleka aẍayêd mezin, hebûna gelek zengînêd biçûk hebûna pirr erdêd perçe perçe peyda kiriye û ev bûye sedemê berberiyêd ku çê dibin.

Ji bilî wendabûna sîstema êlî a kevin, eger em bêjin ku bi carekê propagandeka netewî ya Kurdî ne ketiye Çiyê, û her aliyek amede ye çi bi ser Tirkan ve here, çi bi ser Ereban ve here, çi bi ser Firansizan ve here, emê têbigihêjin çima ev herêma perçe kirî di warê siyasî de erdekî pirr î şov e ji pêlangêd derve re. Ev yeka hanê wê bihêle ku emê baş durvêd Tevgera Murûdan binasin.

## 2- Pirsa olî :

Rastiyeke diyar e ku di civakêd Kurdî de serekêd olê rolekî xwe yî siyasî yî mezin heye. Ra sala 1930, ew rol kok li Çiyê wekî deverêd dinê tune bû. Mezhebêd mezin tenê çend murûdêd xwe hebûn. Qadiriyan, Şêxekî wan li Meydankê [1] hebû; Rifa'îyan, Şêx Evdilrehman li Bablîtê [2] hebû, dora sed murûdêd wî hebûn; û Neqişbendiyan, Şêx Ehmed Lameh li Şamê hebû, carcarina dihate derdorêd Ezazê pere kom dikirin.

---

1 Şêx Îs ê ku kurê wî ji aliyê Murûdan de li sala 1938 de hatî kuştin.

2 Mezhebêd tenê ku li Kurdistanê bi bandûr in mezhebê Qadirî ye, ê Neqişbendî ye,.Hebûna mezhebê Rifa'î li Çiyayê Kurmênc ji nêzîkbûna wî ya Helebê de hatiye, bajarê ku ev mezheb tê de geş e. (Bablût gundek e, ê Mustefa Axa (Gênc) bû, niha Ereb tê de rûniştine - wergêr).



INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Tevî ku Kurdêd Çiyê pirr bawermend in, ew gelekî ne oldar in. Bi awakî ne rêk û pêk şertêd ola Islamî tînin pê (nimêj, rojî, hwd...) û, bê gûman, mirov li tu dera Sûriyê mîna Çiyê mizgeftan kêm na bîne. Serketina Murûdan ji egera [1] civakî ya vê tevgerê de hati bû, ne ji hilatina fanatîzmê bû.

## 3- Pirsa civakî :

### a- Nîzama hebûnê :

Wekî me berê li pêş got ku nîzama çandiniyê li Çiyê ku bi kar tê nîzameka hebûna pirr e. Erdêd herî girîngtir Geliyê Efrîn e, navça Şikaka û navça Biyan e. Li ser erdê Biyan, mala Şêx Ismayîl Zade bi tena xwe bîst gundêd xwe hene [2]. Li nik Şêxan (bêtir li bakur), û li nik Amkan, erd î perçe kirî ye. Mirov li wir hejmareka baş ji gundiyêd biçûk êd halxweş dibîne, berebere vedimrin û erdêd wan bi ser maldarêd navîn û mezin de diçin.

Evêd dawî - maldarêd navî yêd mezin -, bi rastî, bê west kar dikin ku erdêd xwe bêtir bikin. Erdêd rind di destê wan de ne, ji ber ku pirraniya

1 Eger : 'amil, faktor.
2 Firehbûna erdêd xanedanêd navser di paşkokê de hatiye diyar kirin.

cotkarêd biçûk êd ku bi xwe erdêd xwe diçînin, nikarin tiştekî bi qezenc bidin. Pirraniya caran maldarêd mezin di dema xwe de destê xwe datînine ser erdêd wan û tu mafê wan lê nîne ra bihayêd wan ve ne din. Tiştek jê hêsantir ji aẍayê natêr û xwedî desthelatdariyêd siyasî re nîne ew dikare xwe di dadgeh û dezgeha de bide nas kirin, li pariyêd erdêd biçûk xwe lê bi xudan ke, mûsimêd hazir ji xwe re bibe [1].

Wamêd [2] ku bi navê rihînê tên dayîn tevî ku pirr bûn, karekî pratîk bû, î bi qezenc bû. Berê aẍa pêşinde silfeka pirr mezin dida ê gundî (50% ji bo 7 mehan). Pirraniya wextê, dêndar nikare giraniya ziyanê bikşîne [3]. Berebere, dên têne ser hev sermayekî mezin jê çê dibe û, paşê, gundî bêgav dibe erdê xwe li şona dên bi ser xudanê dên de berde.

---

1 Gotina Rojê Lêsko pirr rast e. Ev diyardeya hanê di gelek gundan de çê dibû, ji ber ku gundî nexwenda bûn, nemaze bi zimanê Erebî yekcar nizanîn. Vê sedemê dihîşt kesêd ku peywendiyêd wan bi desthelatdariyêd siyasî re hebin, çi aẍa bin, çi mixtar bin, gelekî mafêd gundiyan bixwin. Hinêd wan ra gundî bi dekêd xwe dixapandin û erdêd wan li ser navêd xwe datanîn û mûsimêd wan ji xwe re dixwarin. Nimûne gelek in - wergêr.
2 Wam : qerz, dên.
3 Em nimûna dêndarêd ku guhêd xwe ne didane birina pisûlê (kaẍeza ku tê de dên têye nîşan dan) naçar dibûn ku eynî dênekî pirr carkî bidin.

**b- Kontra (senede) :**

Tonê kontra ku pirr bi kar tê, kirêkirin [1] e. Maldar êrd û tov dide, berê pak yê mûsimê (ango, jêkuştina vêrgiyêd êrd û mesrefêd xudiyê êrd) bi nîvî têye parve kirin. Cotkarê ku erd kirê kirî divê fayîza silfa ku axê dayî wî ji para xwe der xîne. Vêca, di zikhev de hemahema cotkar, ji bo debara jiyana mala xwe, xwe li ber salê dixîne ra sala dinê.

Cûmiyan ku têkarkirina adetêd Ereban bêtirî êd dinê li ser wan diyar e, cûreyekî din ji kontra li ba wan heye, navê wê Mûrebe'. Axe êrd dide, tov dide, dewêr û xwarina dewêr dide. Çareyeka mûsimê ji cotarî re dimîne.

Herwekî navçe tijî darêd zêtûnê ne, mekbesêd zêtê pirr peran ji xudanêd xwe re der tînin. Xudanê mekbesê 100 diram zêt serê her 4 lîtir û 6 weqiyan distîne. Bi ser de jî, bêrîn jê re dimîne, careka dinê bêrîn tê guvaştin, zêteka tal jê der dikeve. Salek xirab, salek çê, her mekbesek ji 1000 heta 2000 L. S. der dixîne. Gotinê na xwaze ku xudanêd mekbesan axe ne, na hêlin kesek li hember wan mekbesekê bigre.

---

1 Kirê kirin : îcare kirin.

Pirsa mekbesêd zêtê wê ciyekî xwe yî girîng ji nav daxwazêd aborî yêd Murûdan de bigre.

Ev lênêrîna bi lez ji rewşa Çiyê ya siyasî û civakî re rind xuya dike ra ku derê ev navçe ji tevgereka wekî ya Murûdan re hati bû hazir kirin da ku tê de rola xwe bilîze. Şerêd axan êd bê rawestan, kêmbûna desthelatdariya wan, tûrrebûna gundiya, hemî hîşt ku armanca hêvoşkeran bi hêsanî bi cî bibe. Îbrahîm Xelîl ev tê der xisti bû.

# V- DESTPÊKA MURÛDÎTIYÊ LI ÇIYAYÊ KURMÊNC

Derketina Murûdîtiyê li Çiyayê Kurmênc li dawiya 1930 bi saya qewîtiyêd Îbrahîm Xelîl bû. Vî kesî, navê wî yê rastî Îbrahîm Xelîl Sûk Oẍlu bû, î Tirk bû. Sala 1897 li Borca, li Îzmîtê bû. Leşkeriya xwe di dema Cenga dawî di nav leşkerê Osmanî de kir. Paşê, birîndar ket. Dora salêd 1925 hate Sûriyê û ji gelek şêxan mezhebêd cêwaz hîn bû [1], şihada xwe, îcaza hînkirinê, stand. Kireka wî ya derveyî rêkê karê wî wekî mirovekî olparêz ra demekê radiwestîne. Piştî ku kete girtîgehê ji Sûriyê hate avêtin. Diyar e hîngê ew çû li Îslahiyê rûnişt û çend Murûd ji gundêd Kurdan li dora xwe kom kirin. Li wir piştî ku Tirkan xêr pê ne kirin, sala 1930 sînor derbas kir û hate Sûriyê, li Şamê çend meha ma, paşê zanava Sûrî stand. Pê re, hat li Zareta Şêx Orozê, li Balûrsangê, gundê Fayîq Aẍa, ma.

1 Şêx Ebû Nasir ji Ḧumsê (Neqişbendî), Şêx Seyîd Karî ji Şamê, Şêx Seyîd Bedir ed Dîn Misrî ji Şamê (mirî ye), Şêx Ehmed Mûrad Xalêf, Şêx Îbrahîm Xelîl xwe dike nîşan bide ku ew bi adet-madetêd 41 mezhebêd rengreng ho bûye.

Malbata Şêx Îsmayîl Zade bi dilekî germ ew ḧewandin, bawer kirin ku wê ji xwe re kelkê jê wergirin û giraniya wî wê ji wan re bimîne. Hêviya wan pûç ket çima carekê Şêx dît ku murûdina pirr li dora xwe kom kirin, ra bû ji xwe re kar kir.

Şêx Îbrahîm Xelîl û mala Şêx Îsmayîl Zade ji hev sar dibin. Şêx destê xwe dide gundiyêd reḅen û wan bi aliyê xwe dixîne. Ji nav wan gundiyan Ḧenîf û komirciyekî kevin, navê wî Elî Ẍalêb, vedibijêre û li ser kerameta şêxîtiyê xudan dike. Gava dîsa Şêx ji Sûriyê der dikin û davêjin Tirkiyê, rêça nû dispêre va her du kesan û bi ser de ber dide.

## 1- Kokêd Murûdîtiyê :

Gotina "murûd" koma gotina "murîd" e [1], ji şagirtêd ḧemî mezhebêd olî (terîqe) re bi kar tê, lê ji serhildana Şamîl li Qoqazê û bi vir de ji Neqişbendiya re bi taybetî bi kar tê. Ev mezheba li Bûxara li sedê XIV ji aliyê Beha el-Dîn Neqişbend de hate ava kirin. Cudabûna vî mezhebî ji mezhebêd dinê di warê ortodoksiya xwe de, di hêsankirina dîsîplînêd xwe de, di cîgirtina mêtodêd xwe de, rê da mezhebê Neqişbendî ku zû belav bibe û bi serkeve û

1 Mebesta Rojê Lêsko ku bêje di zimanê Erebî de wisa ye - wergêr.

di mîrîtiyêd Transoksiyanî de bibe mezhebê wê demê. Berebere, tamarêd xwe li Hindistanê jî berdan, gava ku Paşa Baber, yek ji şagirtêd vî mezhebî, hate ser têxt. Ji wir, vî mezhebî, tava xwe avête ser Rohilata Dûr a Musulmanî, ser Hindistanê û ser Çînê.

Li destpêka sedê XIX, belavbûna vî mezhebî bêtir erdekî berfireh girt. Olparêzekî ji Silêmaniyê - Kurdistan, navê wî Şêx Xalid, li Mekê, sala 1820 koçerî, raste mezinekî Neqişbendî ji Hindistanê tê [1]. Ew dibe şagirtê wî û *îcazê* jê werdigre. Li vegera xwe ya gund, gelek murûdan li dor xwe kom dike û şandiyarêd xwe dişîne Sûriyê, Tirkiyê û Kurdistanê. Pend-şîrêtêd xwe li her cîyî deriyêd fireh jê re ve dibin. Mezhebê Neqişbendî pirrtir li nav Kurdan belav dibe tevî ku hîngê Qadirî ji hemiyan xurtir bûn û li dijî wan der keti bûn [2]. Dema ku Şêx Xalid sala 1923 li Şamê dimre, mezhebê Neqişbendî ku berê li Rohilata Nêzîk tenê çend murûdêd xwe hebûn, bû yek ji girîngtirînêd mezhebêd Emperetoriya Osmanî.

---

1 Şêx Xalid (1777-1827) ne tenê kesekî oldar bû. Dîwanek semivîsa wê *Dîwanî Bîlaxet-'înwanî Mewlane el-Şêx Mucedidî Tarîqi Neqşbendî Ziya' el-Dîn Xalid*, li Istenbûlê, 1260 Koçerî/1844 Zayînî hatiye çap kirin. Şêx Xalid helbbestêd xwe yêd olî bi zaravê Goranî nivîsandine - wergêr.

2 Da ku bandûra xwe biparêzin pirranî ji nav wan bêgav bûn û xwe kirine Neqişbendî. Di Musulmantiyê de çê dibe mirov di eynî demê de li ser pirr mezheban be.

Bandûra vî mezhebî di salêd paşiyê de mezin bû. Şêxekî ji wan, navê wî Şamîl, karî şêxêd olparêz êd kevin hilanîna û dewleteka Xwedê-nûner û wekhevî li Qoqazê li ser şopa Sunî damezranda. Şêniyê wê berxwedaneka ḧişk dane ketina Rûsa di navçê de. Diyar bû ku Şamîl keti bû bin bandûra mezhebê Wehabiyan ku hîngê li ser piya bûn. Wî jî wekî serokêd Ereban li ser rêya Quranê û li gor 'adetan ḧukmê xwe kir, li dijî nûbûnê ra bû, mîna vexwarina tutûnê û qeḧwê.

Tu girêdan di navbera Îbrahîm Xelîl û Şamîl de nîne, wekî dinê, mirov ḧez dike bizane ku pirr tiştêd Murûdêd Çiyayê Kurmênc mîna yêd sedê XIX li Qoqazê hene.

## 2- Durvêd olî yêd Murûdîtiyê :

Mezhebê Murûda mezhebê Îslama ortodoksî ye, ḧemî şert û qanûnêd xwe Sunî ne; nimêj, rojî (Îbrahîm Xelîl giraniya xwe da ser her pênc demêd nimêjê û ser rojiyê jî), zekatê û hwd... Bi ser wê de jî, Îbrahîm Xelîl bi carekê mûzîka derveyî olê qedexe kir û li dijî vexwarina tutûnê der ket. Qewîtî dan murûdêd xwe ku riyêd xwe mîna riyêd Pêxember berdin. Herwekî li Rohilat nîşanêd ji derve de (eşkere)

bayîxiyeka xwe ya girîng hebûn, berdana riya li Çiyê ji Murûdan re bû nîşaneka diyar [1].

Neqişbendiyan temrînêd olî yêd pirr gewre û giran kêm kirin û hêsan kirin. Şêx Henîf û bê gûman serokê wî, Îbrahîm Xelîl jî, ji wan temrînan watayeke tarî standi bû. Du şeva tenê çend nimêj dikirin : şeva duşemê û pênşemê bi pêşîmamiya şêxekî, yan pîrekî, bi zikrê diketin. A dinê, ev zikra (mîna rêça Şerefiya) bi dengêd bilind dibû, ne bi dengêd nizim û di ber xwe de jî dibû; vajayî yek ji qewîtiyêd herî hişk êd serokêd Neqişbendiyan [2].

## 3- Murûdîtî û pirsa civakî :

Mîna pirraniya tevgerêd dinê yêd olî li Rohilat, Murûdîtî li Çiyê ne digîşte serketina xwe eger hin daxwazêd civakî rewa ne kirina û ne xwestana. Şêx Îbrahîm Xelîl û mezinêd wî yêd di bin wî re jîr bûn û zanîn çawa kelk ji gazinêd gundiyan

---

1 Bi gelemperî, Kurd riyê xwe kurr dikin û simêlê xwe tenê ber didin. Gewreyêd Ezdiyan (pîr, Şêx, Feqîr) riya ber didin, wekî dinê dirêj na kin. Murûd, wekî Musulmanêd kevin êd bajarî rîyina pirr kin ber didin, hinarêd rûya, çeng û ra bi simêla digirt.
2 Zikir tonek e ji xwendina gotinekê, pirr caran li ser hev dibêjin. Dibe ew "derveyî" be, ango, bi dengekî bilind, bi dîlan an ne bi dîlan û bi destan tê kirin. Zikir "hundurî" ye, ango, di dilêd xwe de dibêjin. Neqişbendiya zikra "derveyî" bi hişkî qedxe kiri bûn, û zikra "hundurî" helal kiri bûn çima, li gor wan, ev ortodoksî ye.

wergirtana û li dijî aẍan bi kar banîna. Hema ku wana piştgir ji xwe re kom kirin û gavek avêtin, gava dudiyê dest bi karê xwe yê olî kirin, pişta xwe dane aẍayêd ku destpêkê alîkariya wan kirinî, da ku di rêya wan re destê xwe bidine xelkê biçûk. Pirraniya piştgirêd wan jî cotkarêd dêndar bûn, ji êd ku erd ji wan hati bû standin, ji bêkarêd tiral êd ku jiyana wan ne baş bûn. Mezinêd Murûdan ra çû bûn destêd xwe dabûne çetayekî nenas, navê wî Reşîdê Îbo bû, ji gundê Belalîko [1] bû. Reşîdê Îbo yê ku piştî her kuştinekê direviya çiyê, paşê di şera de dibe serekê Murûdan [2].

Helbet, siyaseta wan ew bû ku bi carekê wa alîkariya hin zengînan wekî Hüsên 'Ewnî, kesê ku dixwest wan ji xwe re ji bo berjewendiyêd xwe bi kar bîne, ji xwe re bi şonde ne din. Demekê bi xwe xwe jê ve nêzîk kir. Wekî dinê, ew dostaniyêd hanê kin bûn û her du serî bi hev ne bawer bûn. Armanca Murûdan ji qebûlkirina alîkariya aẍan ev bû ku wan bêtir ji hev perçe bikin.

Murûdan bêtir piştgirêd xwe bi pirranî di navça bakurê erdêd Biyan û Şêxan de çê kirin : gundêd ku xudan erdêd biçûk lê hebûn û hinekî ji bin destê aẍan der keti bûn, gerek bû li ber xwe bidin

1 Bilêlko ? - wergêr.
2 Ev paragrafa jorin teve semivîsa wê dîsa di *Studia Kurdica* de belav ne bûye.



INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

çima ku axan her tim dixwestin erdêd wan jê bistandana. Murûd pirr berve başûr ne çûn tevî ku rêk ji wan re xweştir vekirî bû; malmezinêd ku li vê navçê hukum dikirinî baş xurt bûn ku li dijî firebûna Murûdan li navçê der kevin. Dîsa, Tevgera Murûda dereng ne ket ku partîzanina xwe, hineka nas kirî û ji çînêd cewêlek di pirraniya wan gundan de çê bike.

Dema ku têra xwe piştgir kom kirin û soz dane hinekan ku erdêd wan êd ku ji wan bê heq hatine standin vegerînin, hinekêd dinê ku dênêd xwe ne din, hinekêd dîtir êd ku zor lê bûnî heyf werin standin [1], Şêx û hogirêd wî dest bi karê xwe kirin : destpêkê, karê çetatiyê kirin (hêrişêd çekdar pirranî bi destê Reşîdê Îbo kirin, jin revandin, vêrgî bi zorê standin). Hema ku wan carekê ciyê xwe girtin, destêd xwe xistine hemî gelşe û deran, murûdêd xwe têve didan ku werin pêkanîna dadê ji wan bixwazin; çetayêd wan bi darê zorê hukmê xwe dianîn cî. Di nava salêd 1937-1938 de, zepkirina mûsima, erdan, malan û mekbesan berebere bûne karêd rojane. Hejmara wan hingî pirr bûbû, xemek çê dikir.

Di çiriya paşin 1938 de, Îbrahîm Xelîl pirr pê de çû ra rê da gundiyan ku, bê sedem, erdêd Şêx Îsmayîl Zade wekî dixwazin bixine bin destê xwe.

---

1 Rev li Çiyayê Kurmênc pirr dibe û gundiyêd ku jin an keçêd xwe ji aliyê axa de têne revandin, nikarin tiştekî bikin.

Gotinê na xwaze ku fêdegirtinêd mezin ji vê siyaseta malzepkirina kesane, ne ji murûdê biçûk re bûn, ji Îbrahîm Xelîl û ji kesêd jê ve nêzîk re bûn : perêd sezan [1] ji xwe re dibirin, mekbes ji xwe re bi kar tanîn, Murûd bi diyariya jî dihatin razî kirin. Daxwazêd wan, li paşiyê, hîşt ku milet hinekî ji pişt wan vekşê.

1 Seza : ceza, 'uqûbe.

# VI- DURVÊ SIYASÎ YÊ MURÛDÎTIYÊ

Eger mêldariyêd civakî û olî yêd Murûdan rind têne xuyan, durvêd wan yêd siyasî kok hindik diyar in. Ji serketinêd wî yêd pêşin de, Îbrahîm Xelîl baş zanî werîsêd meseleka wiha lihevketî bixistana destêd xwe û ji xwe re bi kar baniya. Carina bi hev re, carina li pê hev, Î. Xelîl hin axayêd Çiyê, Kutla Netewî [1] û Tirkan, bi aliyê xwe xistin. Di nava vê tewşê de, Î. Xelîl bi hêsanî cî ji xwe re çê kir û carcaran jî kuleh [2] didane serê hevalbendêd xwe, ewêd ku bawer dikirin ku ji wî zanatir bûn. Eger em bixwazin hemî durvêd Murûdan binasin, pêwîst e em vê tevgerê di warê siyaseta deverîn de li Çiyê, peywendiyêd wê bi netewê Erebî re û girêdana wê bi pêlangêd Tirkan re, binêrin.

## 1- Murûdîtî û siyaseta deverîn :

1 Ya Ereban - wergêr.
2 Kuleh : kum. Di vir de *xap* hatiye.

Aẍayêd Çiyayê Kurmênc zû haydar ne bûn ku Murûdîtî ji wan re metirsiyek e : ji şona hên ku ew teze bûn lê bidin, pirrêd aẍan çûn mezinêd Murûdan bi ser xwe ve anîn, da ku kelkê ji bandûr wan li navçê bigrin. Sala 1936, dema hilbijartinê, Kor Reşîd û Ḧusên 'Ewnî xwe avêtine Şêx Henîf da ku piştạ wan bigre [1]. Bi saya Murûdan, namzadê [2] dudiyê, Ḧusên 'Ewnî, di hilbijartinê de bi ser ket û bû nayîbê Çiyayê Kurmênc li parlemana Sûriyê. Tevî ku Ḧ. 'Ewnî, mirovekî zû xwe diguhart, carina bi Tirkan re, carina bi Ereban re, carina bi Firansizan re, lê dîsa danstandinêd xwe ra sala 1938 bi Murûdan re baş hebûn, paşê, peywendiyêd xwe ji hevdî hatine birrîn.

Îbrahîm Xelîl bi werîsê berberiya di navbera her du biran, Xelîl û Mûsa, de lîst û wiha karî li Geliyê Meydana rûnişta. Ev ḧerêma ku ji aliyê sirûştê de pirr hatiye parastin û ji sînor ve dûr e, fermandariyeka mezin ji wî re aniye pê. Î. Xelîl destê xwe da Xelîl û, wekî Mûsa sala 1937 hate kuştin, karî ḧerêmê tev bixe bin destê xwe.

---

1 Hemberhevketina Ḧusên 'Ewnî, serekê Şêxan, û Kor Reşîd, serekê Biyan, berdewamiya kêm an pirr a berberiyêd wan êd kevin in. Di warê hozan de, şerêd Murûdan û Aẍan jî diyar dibûn berdewamiya şerêd Şêxan û Biyan in. Murûdêd Îbrahîm Xelîl ji nav Şêxan pirr bûn û ji nav Biyan pirr hindik bûn. Helbet, gerek e mirov vê beramberkirinê pirr dûr ne be.
2 Namzade : candidat, mureşeḧ.

Dawiya sala 1936, aẍa êdî têgihîştin ku ji bo bergîriya berjewendiyêd xwe bikin, çêtir e werin ser hev. Pirr caran li hev kom bûn, wekî dinê kok nikarîn bighîştina hev : dexsêd pirr û şerêd kevin ew perçe kiri bûn. Her yekî di aliyê xwe de, berdewam kir, erdêd xwe parast û tolêd kuştiyêd xwe vedan, bêyî ku hêviya alîkariyê ji hevsiyêd xwe, ne hema ji merivêd xwe, bixwazin. Fayîq Aẍa (ji malbata Şêx Îsmayîl Zade) gelek gazinêd tal ji pismamê xwe, Şêxo Aẍa, ê ku pê re ne yî xweş bû, dikirin ku kok di hawara wî de, di rojêd herî reş de, ne hat. Sala 1938, hin aẍa ḧaziriya xwe dane diyar kirin ku bi Îbrahîm Xelîl re li hev werin da ku Şêx Îsmayîl Zade qels bixînin.

Van pêlang û dubaran ḧemî karê Murûd hêsan kirin ku di şerêd xwe de li dijî dijminêd xwe bi ser kevin.

Mêjûya peywendiyêd Murûdan û Kutla Netewî dighêje meha çele 1936. Sûriyê, wê gavê, di ḍemeka siyasî ya li hev ketî de bû. Netewparêzêd Ḧelebê dixwestin hevalbendiyan bi mezinêd Murûdan re deynin da ku li Çiyayê Kurmênc berberiya peyda bikin. Hebûna peymanê hîşt ku ew destê xwe jê bikşînin, lê dîsa hevalbendiyek bi hev re danîn û, li îlûla 1936, Elî Ẍalêb li Efrîn pêşpîrî wefda Sûriyê ku ji Firansa bi tirêna "Rohilat Express" dihatî, bi germî çû. Li pêş 200-300 peyayêd xwe, Elî Ẍalêb sonda piştevaniya xwe ji pirsa netewî re xwar.

Ji aliyê xwe de, ḧukmeta Sûriyê xwe bi şon de ne da ku dostaniya Murûdan ne ke, çek didane wan û cendirmegehêd xwe agehdar dikirin ku Murûdan ne tengijînin [1]. Di nava çaẍeka dirêj de, Murûdan serbest telefonêd cendirmegehan bi kar tanîn. Reşîdê Îbo ku di sala 1937 de hatî girtin, piştî teḧqîqeka fermî û rotînî hate berdan. Eger hin mezinêd Murûdan li Ḧelebê sala 1938 di rûniştina zorane de bûn armanca wê yekê ew bû ku milet di xewê kin. Pêna [2] ku Îbrahîm Xelîl sala 1938 ketî Sûriyê, gewretirîn siyasetzanêd Sûriyê berve wî çûn û ew ḧewandin. Li dawiya wê salê hinek sarbûn kete peywendiyêd di navbera Kutla Netewî û Murûdan de, ev Murûdêd ku nokerêd Tirkiyê bûn. Sarbûna peywendiyêd wan bi hev re kin bûn. Di serhildana 1939 de, Çiyayê Kurmênc di rêya Netewparêzan re ji çekêd Firansizî êd ku ji Şamê hati bûn dizîn, tijî bûbû [3]. Di mejiyê serdarêd Ḧelebî de ev hebû : berxwedana Kurdan li dijî tabûrê [4] ku ji wan re çûyî wê bibe nîşana serhildana bakurê Sûriyê tevî. Di destê me de nîşan hene ku maẍina [5] çekan ji bo vê hêviyê hatin tijî kirin.

---

1 Peywendiyêd desthelatdariyêd Sûriyê bi Murûdan re di rêya Eḇdo Misrî û Necîb 'Ewed, her du hêvojker û çekfiroşêd navdar li Helebê, re hebûn.
2 Pên : gav, dem.
3 Pareka baş ji çekêd ku li Çiyayê Kurmênc bi kar tên êd Firansizan in.
4 Tabûra Firansizî - wergêr.
5 Maẍ : xanî, şikeft.

## 2- Peywendiyêd Murûdan bi Tirkan re :

Herêma Çiyayê Kurmênc ku tê re tirên diçe Mûsilê berjewendiyêd giran êd Tirkan tê de hebûn. Hebûna Murûdan ji wan re keysek bû ku destê xwe bixinê. Destpêka çalakiyêd Îbrahîm Xelîl bi hêsanî derbas ne dibûn. Di navbera sala 1930 û 1935 de, Tirkan biryar li dijî wî stand ku Şêx li qeza Îslahiyê murûdan ji xwe re çê ne ke. Diyar bû nokerêd Tirkan di demeka dirêj de ji wan re digotin ku Murûd peyayêd Firansizan bûn û yêd Ermeniya bûn. Agehdariyêd [1] ku Tirkan ji Bêrûtê re hewal didanî li ser mesela çetayêd ku şeran li ber sînor dikin, diyar bûn rast in. Paşê, Tirk têgihîştin ku lihevhatina wan bi Murûdan re du fêde tê de hene : yek, sînorêd wan ê bi aş bin; dudu, ev dihêle ku gelşan di rêya Murûdan re li Sûriyê çê bikin dema ku bibînin dem lê were [2].

Tevî ku mêjûya ketina Şêx di nav Parastina Nihênî (muxaberat) ya Tirkan de ji me ve bi temamî ne diyar e, em dikarin bêjin ku ew bi hindikî dighêje salêd 1935-36 : sala 1935, Şêx li Bîrecikê di rûniştina zorane de bû. Sala dû wê re, dema hilbijartinê, Şêx bi

---

1 Ango înzarêd ku li wir didanê Firansizan - wergêr.
2 Ji vê gotina Rojê Lêsko mirov tê digihêje ku ji destpêkê de Îbrahîm Xelîl ne nokerê Tirkan bû. Bi gotineka dinê, Tevgera Murûdan wekî diyar e tevgereka civakî bû, ji nava mercêd civakî yêd xirab hilat û li dijî dagîrkeran û axan rabû. Paşê, her aliyekî xwest kelkê jê wergire - wergêr.

erkekê şandi bûne Sencaqê [1]. Piştî wê, ferman ji wî re tê ku here "agehdariyan li ser çalakiyêd Neqişbendiyan li Çiyayê Kurmênc û li Tirkiyê kom bike" [2].

Şêx li Tirkiyê rûnişti bû, dîsa ferman û çek ji Murûdêd xwe re dişandin. Hinek zabitêd Tirkan, wekî Teyfûr Beg (berê li Xesa bû, niha li Hetayê ye) û Heyder Beg (li Kernebê) dan-standinêd xwe tim bi wan re hebûn. Yek ji fêdêd wan dan-standina haya gumrika Kemalîstan ji çetan çê dibû. Dîsa, em dizanin ku jêrzabitekî Tirk, Bekir Efendî, rolekî girîng di çêkirina çetayêd ku şêniyê Çiyayê Kurmênc sawî kiri bûn de lîst. Ji bo vê yekê, Wezîrê Karêd Derve yê Tirk, di wê demê de, ne disekinî, tim li ba Komîsariya Bilind a Firansizî protesta navehesîbûn û naparastina ku li Çiyayê Kurmênc dibûyî dikir.

Sala 1939, çaxa ku murûdêd Şêx Îbrahîm li dijî hêzêd Firansizî yêd ku ji wan re hatinî şandin ra bûn, hinek zabitêd Tirkan alîkariya wan kirin, derbaskirina wan di sînor re hêsan kirin. Di eynî demê

1 Bi Tirkî jê re dibêjin Iskenderon, wa erdê ku rûniştiyêd wê Kurd û Ereb in, li sala 1938 bi ser Tirkiyê ve çû. Pê re, Tirkan destêd xwe xistinê.
2 Nameya nihênî, hejmar 29402, a Parastina Gelemper a Tirkiyê ji Dadgeha Bîrecikê re li mêjûya 14.6.1939. Ev name di dosiya hukmê ku vê dadgehê li 14. 3. 1940 dayî Şêx de ye. Wêneyek ji vê namê li ba Ehmed Seydawî, dostê Îbrahîm Xelîl, li hizêrana 1940 li Helebê, hate girtin.

de, propagandîstêd wan milet têve didan [1] ku penaberiya Tirkiyê bikin. Pirrekan ji wan bawer kirin. Ji hîngê de, piraniya wan vegerîne Sûriyê, wekî dinê çendek jê razî bûn ku li Qiriq Xanê, li ser erdêd ku berê Ermeniyan li şona xwe hîştinî, bimînin. Wekî Murûdan li Çiyê der dan û bazdan, Tirkan Şêx û mezinêd di bin wî re hewandin, li ba xwe hîştin ku careka dinê fêdê jê bigrin eger keys lê hat. Pê re, Şêx şandine Bîrecikê û li wir kirine rûniştina zorane. Şêx li 4 berçile hate girtin çima ku dijminê wî, Komîsêrê polîs, Niyazî Uz Alp, raporek li ser wî da bû ku Şêx "mezhebê Neqişbendî ji sala 1930 de li qeza Îslahiyê ava kiriye û jê re kar kiriye" [2] û hinek kuştinî jî kirine. Li 4 adara pê re, Şêx birine ber dadgehê û, paşê, Şêx bi peran der ket. Şêx xwe bi pakî ji gunehbarkirinêd dadgehê bi saya Parastina Gelemper a Enqerê [3] xelas dike.

Hema ku Şêx bi desthelatdariyêd Tirkan re li hev tê, li hizêrana 1940 ji "rûniştina zorane" direve. Çaxeka kurt li Sûriyê dimîne, pê re, vedigere Tirkiyê piştî ku cendirmekî li Helebê dikuje. Ra heyamekê li derdora Kilisê li pêş çavan û bi haya milet tevî dimîne. Desthelatdariyêd Tirkan li ber sînor jê hatine

1 Têve didan : dihêvotin.
2 Bi destdirêjkirina ser paltûza xwe hate gunehkar kirin. Şêx berê ji aliyê Tirkan de li sala 1938 hati bû girtin, lê zû hate berdan.
3 Rengek ji parastinêd Tirkan e.

xwestin ku Şêx bispêrin, wan bersiv da ku Şêx li Sûriyê dimîne û protesta vegera gelşêd ku hebûna Şêx çê dike, kirin.

Ku Tirkan dixwestin berî gişî gelşan li Çiyayê Kurmênc peyda bikin, an didîtin fêdetir e li ser du kêndiran bilîzin, bi piştgirtina Murûdan têr ne kirin, gerîn ku nokerina xwe di aliyê dijminê xwe de biçînin. Pirr caran, têkiliyêd xwe bi axan re danîn. Sala 1936, çek û pere di rêya Seydê Dîko re didane wan. Sala 1938, erkek dane Husên 'Ewnî, ê ku bûbû yek ji netewparêzêd Tirk piştî pêxistina Sencaqê bi ser Tirkiyê ve, da ku malmezinêd li herêma Çiyayê Kurmênc bihêvoje, hîn bike da ku Çiyayê Kurmênc bi Tirkiyê ve xînin. Dibe ku mirov mat bibe ku tevî Tirkan alîkarî eşkere didane Î. Xelîl, wan dikarî dostina xwe, ra ne rast bûna jî, ji nav aliyê dijminê Murûdan de peyda bikirina. Di ser gişî re, gerek e em ji bîr ne kin ku sistbûna siyaseta Firansizan dihîşt ku destberdana navçan di gûmanê keve; çêtirîn dostêd me bi xwe biçin têkiliyêd xwe yêd germ bi êd ku wê ciyê me bigrin re girêdin.

# VII- DÎROKA MURÛDÎTIYÊ LI ÇIYAYÊ KURMÊNC

Dîroka Murûdîtiyê li Çiyayê Kurmênc bi sê deman tê beş kirin : a yekê, ku li jor hatî xwendin, li ser destpêka tevgerê ye; a dudiyê, ji 1933 ra şibata 1938 dirêj dibe (mayîna Şêx li Tirkiyê ); a sisiyê, ji şibata 1938 (vegera Şêx a Sûriyê) dirêj dibe ra adara 1939 (roxandina tevgerê), û a dawî, ji adara 1939 de dirêj dibe ra payîza 1940.

## 1- 1933-1938 :

Bi nehebûna serokê wan, mezinêd di bin Şêx re, Şêx Henîf û Elî Xalêb karêd ku hilpesartinî ser pişta xwe pê radibûn. E yekê, bi erka olî ya serdariya mezhebê ra dibû; ê dudiyê, berpirsiyariya berjewendiyêd madî yêd wê dikir.

Geşbûna karê wan bêtir di herêma Şêx Orozê û Belalîko [1] de bû. Wan karîn pirraniya gundiyêd wir

1 Bilêlko ? - wergêr.

bi aliyê xwe xistina. Ra sala 1935, giraniya wan hema hema tune bû, tevî ku Reşîdê Îbo destê xwe dida wan. Ji sala 1936 de, ew bi du tiştan xurt bûn : ji aliyekî de, hevalbendiyêd di navbera Elî Xalêb û Kutla Netewî de; ji aliyê dinê de, peywendiyêd Tirkan û Îbrahîm Xelîl.

Xebata ji bo hilbijartina Reşîd û Husên 'Ewnî hîşt ku murûd xurtiya hêzêd xwe bizanin çiqase ye : namzadeyê wan bi ser ket. Li aliyê dinê, şerêd Murûdan û dijminêd wan fireh bûn, çetayêd Reşîdê Îbo herêma Bilêlko bi sawê xisti bûn. Her hefteyê bêje, şerêd xwîndar di navbera peyayêd axan de çê dibûn, peyayêd ku dixwestin li dora Kor Reşîd û Fayîq Axa kom bibin.

Sala 1937, tevî ku rewş bi gelemperî ne hate guhartin, Murûd hinekî qels ketin : Reşîd Îbo, Şêx Henîf û Elî Xalêb hatine girtin. Piştî çend mehan ji girtineka navî, ew li nîsana 1938 hatine berdan.

## 2- Şibata 1938 - adara 1939 :

Şêx Îbrahîm Xelîl li şibata 1938 vegeriya Sûriyê. Tevî ku hukmê derkirinê ji Şêx re hebû, desthelatdariyêd deverîn destê xwe ne dane wî. Şêx bi serbestî li Humsê, li Şamê, li Helebê jiya. Li her derî, serekêd Netewparêz rêza wî girtin. Rengê pey-



INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

wendiyêd Murûdan bi Kutla Netewî re hîşt ku Murûd ne hêne ceza kirin. Vajayî wê, ḧukmetê alîkariya wan dikir (Me li jor dît ku helwestê cendirman li hember Murûdan çi bû). Murûdan xwe du qatkî toj kirin, vêrgî ji gundiyêd ku li dijî wan bûn standin, destêd xwe danîn ser erdêd aẍan, û li hember dijminêd xwe der ketin û ew kuştin [1].

Li meha çiriya pêşin, Î. Xelîl ji nû ve hat li Çiyayê Kurmênc rûnişt. Ji wê demê de, veḧesî ne ma, ji Çiyê çû. Şêx bi saya alîgirêd xwe yêd çekdar dest bi montaja xwe kir. Şêx, bi xwe, bi destê xwe dadmendî pêk dianî, parvekirineka nû ji erdan re dikir û çekêd gundiyêd ku didît kok bê xêr in (ne germ in) jê distand û dida Murûdêd xwe.

Ev biryarane giş pirranî ji bo malbata Şêx Îsmayîl Zade û partîzanêd wan bûn. Bi vî awayî, tirsa wan xwe gîhande gelek gundiyêd Biyan, ra hinek ḧalxwaşêd biçûk jî û aẍan xwe murûd nîşan dan.

Rewş, pê re, bi rengekî xirab bû ku êdî desthelatdariyêd deverê nikarîn berdewam bikirina çavêd xwe bigirtana. Meha çiriya paşin, parêzgerê Ḧelebê kete meselê, ketineka hema wisa. Şamê mesela ketinê li xwe nena. Paşê, hin siyasetzanêd Sûriyê êdî bi

---

1 Kuştina kurê Şêx Îs li Meydankê di 30 îlûlê de, xwestina kuştina Cemîl Aẍa (şerekê Ezdiya), Kor Reşîd, Fayîq Aẍa, Seydo Dîko û kuştina Ḧeso, neviyê evê dawî, hwd...

peywendiyêd Şêx bi Tirkan re hestiyar bûn. Şêx li meha berçele ra demekê qebûl kir ku ji Çiyê here û ceza 200 L. S. bide. Wendabûna Şêx demeka kin bû. Sala 1939, dîsa bi rengekî geş nevehesî kete Çiyê. Li çile, herêmêd bê parastin dirêj bûn ra ber deriyêd Efrîn û Ezazê. Axayêd ji hemiya dudilîtir, wekî Men'an Niyazî (Şikaka), ji metirsiyê haydar bûn û naçar peyayêd xwe çekdar kirin. Li 13 çile, şerekî mezin nêzîkî Şêx Orozê [1] çê bû. Li 15, Murûdan hêriş birine ser posta Zeytûnekê; li 29, ger [2] hate ser Bêkobasî, û li 24, bû gera gundê Ezdiya, Qestelê.

Desthelatdariyêd Sûriyê, careka dinê, ber pêla wan girt û ra bûn Behîc Beg şandine Helebê da ku her du seriyan li hev wîne. Helbet, şandina wî bê havil bû. Wekî dinê, Îbrahîm Xelîl çalakiyêd xwe li herêma Meydana û Şêx Henîf li Şêx Orozê duqatkî xurtir kirin. Roj bi roj, murûdêd wan pirrtir bûn.

Ketina Hukmeta Netewî li nîvê meha şibatê hîşt ku desthelatdariyêd Firansizî destêd xwe têxine meselê. Ji 28 de, cendirmegehê karî Şêx Henîf û peyayêd wî bigirtana. Meha adarê, tabûrek leşker bi rê ket ku Çiyê pak bike. Piştî çend şeran ku di wan de alîkariya Tirkan û Netewparêzan ji Murûdan re bûbû pişteka xurt, zora çetayêd murûdan çû û sînor derbas kirin. Bi reva wan re, gelek gundî ji tirsa ku neyêd

---

1 Lêvkirina navê vî gundî li Çiyê wiha ye : Şêx Orzê - wergêr.
2 Ger : dor.

ceza kirin bi wan re çûn. Ew ħemî ji aliyê hevsiyêd [1] me de hatine ħewandin, gerekiyêd wan bi cî anîn û ho kirin ku li ba wan bimînin. Tirkan bawer dikirin ku hebûna evqas penaberêd li ser axa wan wê bibe bihana daxwaza pevxistina Çiyayê Kurmênc bi ser Tirkiyê ve.

## 3- Piştî adara 1939 :

Pêna Murûdêd Çiyê bawer kirin ku di vegera wan de tu tengijandin nîne, pirraniya wan vegerîne Sûriyê, tevî ku mêvandarêd wan li hember wan der ketin ku vegerin. Gundêd ku vala bûnî, careka dinê şên bûn û ji meha tebaxê de rewş sêrin bû. Herwekî serokêd wan hati bûn girtin û dûrwelatî kirin, Murûdêd kevin li mala xwe rûniştin, xwe ne dane diyar kirin.

Şêx Îbrahîm ê ku di rûniştina zorane de bû, paşê, ji meha berçile ra meha adarê hati bû girtin, bi carekê ji pêş çavan, ew jî, wenda bû. Çiyayê Kurmênc seranser ra sala 1940 veħesî, sala ku dîsa Murûdan ji nû ve xwe diyar kirin dema ku Seydo

1 Mebest Tirk in - wergêr.

Dodeko, sikrêtêrê Şêx ê berê ku li Sûriyê dimayî û xwe siparti bû, danî kuştin.

Derdanêd [1] Firansa li Ewrupa Tirk tê vedan ku serhildanina nû li Çiyê ra kin, Şêx piştî kuştina cedirmeyekî Sûriyê ku ew nas kiri bû, bi lez kete Tirkiyê. Li tîrmehê, Şêx li ber sînor bi çetan re pirr hate xuyan [2]. Di 'eynî demê de, çend şerêd biçûk li Çiyê di navbera leşkerêd pandinê û murûdêd çekdar de çê bûn. Li 15 tîrmehê, Şêx hêriş bire ser miheta Meydan Ekbesê û, li şeva 26- 27, hêrişî gundê Memala kir. Şandina tabûrina dinê ji leşkerêd li Çiyê û nezanîna rewşa li Balkan hîşt ku Tirk ra demekê xwe ji pêlangêd xwe bikşînin. Di nava çend mehan de, tu bûyerêd nû çê ne bûn. Diyar bû ku Şêx Îbrahîm Xelîl ji sînor bi dûr kirin da bûn.

---

1 Der dan : ziyan, ketin.

2 Ji çeta ev bûn : Reşîdê Îbo, Bekir Efendî, Ḧakim Îbo, Şêx Seydo, Elî Riza. Em bawer dikin li ser gotina Şêx Elî Xalêb li Tirkiyê hate kuştin. (Gava mirov di vê babetê de bikare lêkolînekê li Çiyê bike, pirr tiştêd ḧelez wê diyar bin. Bo nimûne, li gundê Bilêlko tê gotin ku Elî Xalêb birîndar keti bû, li xestexaneka Tirkiyê de bû. Di xestexanê de lê tê û E. Xalêb Şêx Îbrahîm Xelîl bi kincêd leşkerî êd bi stêrk teve zabitina dibîne, hîngê E. Xalêb tê digihê mesela Şêx Î. Xelîl çi ye. Namekê ji mal re dişîne ku êdî nema vegera wî heye, çima dizanî Şêxê wî bikuje - wergêr).

# VIII- PAŞGOTIN

Ra çaẍekê dengê murûdîtiyê ne hat. Murûdêd ku li Sûriyê manî xwe kerr kirin, Çiya hema hema hate bêçek kirin. Dîsa, xurişpiriş, rojekê li vir, yekê li wir, destpê bûn, sedemêd wê yêd civakî û siyasî hên a saẍ bûn, hevsiyê me yî bakur, li serî, ew kesêd li pişt meselê li ba xwe parasti bûn. Vêca, girîng e em bûyerêd Çiyayê Kurmênc şirove bikin û hobûnan [1] jê bigrin.

Berpirsiyariya rûdawêd ku ji 1936 ra 1939 çê bûnî dikeve stoyê qelsî û ne standina biryaran ji aliyê desthelatdariyêd Firansiz de li Sûriyê. Wan tim xwe jê pirr dûr dikirin, digeriyan ku tiştan bi henaseka dirêj û razîkirinekê çareser bikin, ev sedema ku dihîşt alîgirêd me bê hêvî bibin, bê ku destêd xwe deynin ser birîna bûyeran.

Tevgera Murûdan berî gişî tevgereka civakî bû, rengek ji raperînê bû, ji sedema belengaziya gundiyan hati bû. Ji ber vê, ji Şêx Îbrahîm Xelîl re

1 Hobûn : ders.

hêsan bû ku li dijî hin neheqiya der keve û durist bike, karmendêd Sûriyê êd ku bertîl zû ji aliyê maldarêd mezin de dixwarinî xurt bipê û rê li wan bibirre.

**Ji tirsa Tirkiyê re, me** [1] qet ji **Kurdêd welatparêz re ne hîşt ku serbest xebata xwe li Sûriyê geş bikin tevî ku ew xebat wê li Çiyayê Kurmênc ber bida** : xanedan wê tê bigihîştana ku tu berjewendiyêd wan bi girêdana dijminekî miletê xwe re nîn in. Ji aliyê xwe de, şênî jî bi koranî ne dida pê serokekî oldar î TIRK, nokerekî siyasî, ku kêm bi zimanê wan dipeyivî. A dinê, pirr hêsan bû ku çend rêberêd Neqişbendî û Kurd bişandina Çiyê, li dijî Îbrahîm Xelîl bixebitîna û bandûra wî hilanîna.

Dawî, helwesteka bê bawerî û pirr xurt li hember Tirkan têr dikir wan serwext bike ku alîkariya wan ji Murûdan re bê havil e. Tenha, dudiliya me rê daye wan ku bi vê kertê bilîzin.

---

[1] Di vir de, R. Lêsko bernavê Firansizî "on" bi kar aniye. Mebest tarî ye, lê mirov tê digihê ku xwestiye Firansizêd dagîrker sûcdar derxîne. Bila were bîra me ku welatparêzê bêhempa Osman Sebrî (Apo) hîngê ji aliyê Firansizan de du-sê caran hate dûrwelatî kirin. Çi Firansizan, çi Îngilîzan kerta kurdî di destê xwe de kiri bûne şûrek û di ser serê Kemalîstan re girti bûn - wergêr).

Sînorekî sist pandî - û hên wisa ye - ketina destê Tirkan di meselê de hêsan kir. Çi cara ku me livêd xwe nîşan didan, hevsiyêd me dudilî dibûn û lîska nokerêd xwe dibirrîn. Haviliya standina biryarêd parastinê, di tîrmeha çûyî de, nîşan dan ku em lîskêd wan ji wan re kok na borînin û em jê re amede ne.

Çiriya paşin 1940

# IX- PAŞKOK

## Hozêd Çiyayê Kurmênc

### 1- ŞIKAKAN

Erdêd Şikakan di navbera erdêd Biyan li bakur, êd Amkan li Roava, êd Cûmê li başûr, û derdorêd Ezazê li Rohilat, dikevin.

**Gund** [1] :

S'erîncekê, Omer Simo, Zeytûnekê, Dêrsiwanê, Îkeda, Ereb Wêranê, Omera, Balûrsangê, Alciya, Elî Bazan, Şera, Xirabî Şera, Sînka, Çema,

---

1 Piraniya gundêd ku em nas dikin, me lêvkirina wan a deverîn daniye. Êd ku em nas na kin, me wekî nivîsara Rojê Lêsko hîştiye.

Qitmê, Qestelê [1], Kortikê, Meşalê, Metîna, Meydankê, Naza, Astêr, 'Emara, Kefer Romê, Qere Coran, Gobeka, Elkê, Kefer Mizê, Deraqliya [2].

Di zik hev de, hoz 39 gundan dadigre, bi qasî 800 kes heye. Erdê Şikaka erdekî bi xêr e, ji rezan, ji darêd zêtûna, ji keriyêd pêz û colêd bizinan re dibe.

**Dîrok :**

Mêjûya rûniştina vê hozê li Çiyayê Kurmênc tarî ye, dibe koka wan bighêje Şikakêd herêma Gola Wanê û bigihêje hozêd ku em bi wî navî li perçeyêd dinê êd Kurdistanê rastî wan tên.

Darê ḧukmê berê di destê mala Celûs de bû (niha Men'an Niyazî ye, nayîbê kevin di parlemana Sûriyê de), ji gundê Şera. Piştî ḧaltenikiya wan û jinanîna ji hev bandûra vê malê berebere vemiriya û li şonê mala Şêx Îsmayîl Zade (Biyan) serî hildan.

---

1 Qestelê û Qitmê Êzîdî ne. Niha Qitmê pirr jê Musulman bûne, an Musulman hatine tê de rûniştine. Rojê Lêsko gundê Baflûnê ji bîr kiriye binivîsîne. Baflûnî Şikakî ne û tev de Ezdî ne - wergêr.

2 Navêd gundêd bin xêz kirî seranser, an perçekî jê bi Murûdan re bûn, dema ku Murûdîtî di geşbûna xwe de bû (pirr mixabin, ev nota gelekî girîng *Studia Kurdica* di pişt guhê xwe re avêtiye - wergêr).

**Xanedanêd navser** :

Men'an Niyazî (mala Celûs) li Sêcerazê, Ehmed Men'an (mala Celûs) li Şera, Ehmed Axa li Kortikê, Îbrahîm Xelîl Axa li Gemrûkê, Cemîl Ehmed li Qitmê, Şêx Îs li Meydankê (Murûdan ew Kuşt).

Hin erdêd axayêd Biyan li nav erdêd Şikaka dikevin, navê wan ev in : Fayîq Axa (ji S'erîncekê), Şêxo Axa (ji Alciya), Hec Reşîd Axa (ji Astêr, Keferîm).

## 2- AMKAN

Erdêd Amkan di navbera erdêd Şikakan li rohilat, êd Cûmê li başûr û êd Şêxan li roava û yêd Biyan li bakur dikevin. Herêmeka pirr çandin tê de na be. Hatinêd wê, ji bilî darêd fêkiyê, xudankirina dewêr û çêkirina komirê ye.

**Gund** :

Amkan dora çel gundî dadigrin : Çetelê, Saxîr Obasî, Zerka, Kalankex, Eşûnê, Hesendêra, Kotana,



INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE

Barkas, Kutanlî [1], 'Epila, Bîbaka, Qaşa, Qizilbaşa, Qermîtliq, Şorbe, Emera, Sêmalka, Bêlê, Orta, Dîkê, Xelîleka, Erebê Kerê, Gola, Kurzêlê, Qartîn [2].

**Dîrok** :

Amkan dibe kevintirîn hoza ku li Çiyayê Kurmênc rûniştî be. Koka wan ji Dêrsimê ne. Dibe ku ew li sedê XVII piştî zivistaneka hişk û biring hati bin bajarî kirin (?). Ji mezhebê Şî'î ne (Qizilbaşî), piştî şerekî ku tê de pişta hevsiyêd xwe yêd Sunî girtin çûne ser ola Îslama Ortodoks. Di wî şerî de, Kela Bedredîn (Çiyayê Hawarê), hate dorpêç kirin. Berê, darê hukim ê siyasî di navbera malbata Şorbe (Oxlu) û Imer (Oxlu) de hati bû parve kirin. Berî niha bi nêzîkî sedekî, gundiyêd Amkî, hîngê ku şerêd bê rawestan di navbera van du malan de çê dibûnî, westiyan, ra bûn Dîko ji xwe re kirine serekek [3].

Di bîra me de be ku di berberiyêd di navbera Şêxan û Biyan de, Amkan, bi gelemperî, pişta Biyan girtin.

---

1 Kutanlî ne Kotana be ? - wergêr.
2 Qorta ? - wergêr.
3 Wekî tê hewal dan, navê mala Dîko ji vê gotinê hatiye : "Emê dîkekî ji xwe re çê bikin"; ango, serekekî vebijêrin, piştgirêd axê yêd nû wisa digotinê.

**Xanedanêd navser :**

Seydo û kurêd wî : Ḧesen, Reşîd, Silêman, Ḧebeş (mala Dîko) li Çetel Koy, Arslan Aẍa (mala Şorbe Oẍlu) li Tirkiyê, Alûs Aẍa (mala Imer Oẍlu) li Bêlê û li Qizilbaşa; Bekir Aẍa (mala Elî Aẍa) li Tirkiyê, Xelîl Aẍa û Eḧmed Aẍa (mala Dûşar Oẍlu) li Şiyê, Ḧenan Aẍa û Eḧmedê Rûto li 'Embara, Ḧec Reşîd Aẍa (Biyan) erdêd xwe li gundê Kurzêlê [1] ne.

**3- BIYAN** (an Ocaq 'Izedîn)

Erdêd Biyan li nav erdêd Şikaka li rohilat, êd Amkan li başûr û êd Şêxan li roava, dikevin. Li bakur, sînor ew kirine du perçe.

Biyan dora 10 000 kes hene, li 45 gundan belav bûne. Piştî Geliyê Cûmê ḧerêma her a zengîn ew e.

[1] Li Çiyayê Kurmênc bi navê Kurzêlê du gund hene : Kurzêla Cûmê û a Çiyê. Mebest li vir Kurzêla Çiyê ye.

**Gund :**

Îkedan, Zeytûnekê, Omer Simo, Şêx Orozê, Mehmûd Obasî, Xay Oxlu, 'Ebûdanê, Jaro, Oganlî, Muqdêd, Şerqanlî, Qurnê, Balî, Koy, Bilbilê, Zara, Elî Kera, Heyama, Baxçe Konak, Elî Begê, Solaqlî, Xidiriya, Kurzêlê, Alçolaq, Bûkê,... Li Tirkiyê : Qazeqlî, Delî Osman, Hesar, Çarçilê, Bûlamac, Qumurlî, Kulgîman, Pêrteklî, Maxercok, Mazar Şêr, Satlî, Sabqanlî, Bekira, Mam Ereb, Martewan, Eliyanlî, Qernebî, Qaybasî, Tenûr, Tasbîh, Golbaşî.

**Dîrok :**

Biyan dibe ku şaxek ji Milan bin, an jî li gor nêrîneka dinê bêtir rast, dibe şaxek ji Reşwanan bin (hoza Kurd a mezin ku erdêd xwe dirêj dibine başûr-roavayêMeletiyayê).

Serekêd vê hozê, berê, ji mala Hec Omer der diketin. Devedevî sala 1850, axayê dawî yê vê malbatê, Deli Xelîl, ku Amkan pişta xwe da bûnê, şerek li dijî Şêxan êd ku Tirkan tê de pişta wan girt, kir. Di şer de ev axa der dide û direve Qaybaşiyê li Gawir Daxê. Demekê şon de, vedigere û hêriş dike, diçe Kilisê. Careka dinê, têk diçe. Desthelatdariyêd Tirkan wî digrin û davêne Edenê. Biyan jî li dijî Şikaka pirr şer kirine.

Têkçûna Deli Xelîl mala Ḧec omer jî bi xwe re kavil kir. Li şona wan mala Şêx Îsmayîl Zade ji Bêkobasî cî girt. Bandûra mala Şêx Îsmayîl Zade ku maldarina xudan erd in, ra roja îro hene. Hên ev mal bêtir bi merivantiyê û destxistina erdan fireh bû û ketine nav hevsiyêd xwe : Şikakan û Amkan.

**Xanedanêd navser :**

Niha malin tên ciyê Mala Şêx Îsmayîl Zade digirin : Ḧec Reşîd Aẍa [1] ku bêtir li Ḧelebê rûdine, Şêxo Aẍa [2] û birayekî wî [3] li Bilbilê, Ḧec Ḧenan, birayê Şêxo Aẍa li Bekobasî, û Fayîq Aẍa [4], neviyê Ḧec Reşîd. Tevî ku hemî ji malbatekê ne, peywendiyêd Fayîq Aẍa û Şêxo Aẍa bi hev re ji sedema

1 Gundêd wî ev in : Kurzêlê, Seceres /parek/ (sêceraz - wergêr), Astêr (Şikaka) û Kefarûmê (Şikaka).
2 Şêxo Aẍa zengînê malbata Şêx Îsmayîl Zade ye. Gundêd wî : Bulbulê (perçakî, Zeytûnekê 1/4), Alciya (Şikaka), Alecî {1/3, Qurnê, Meydankê (perçak)}, Pandêrek (perçak), û çend erdêd dinê li Tirkiyê.
3 Ê ku xwendina xwe li dibistana Xaka Pîroz li Ḧelebê kirî û bi Firansizîdipeyive.
4 Fayîq xwendina Bekeloriya li Ḧelebê kir û bi Firansizî dipeyive. Gundêd wî ev in : Dêrsiwanê (perçakî bi Şêxo re), Zeytûnekê (1/4), Balûrsangê (Şikaka), Serencak (Şikaka), Bakobasî (1/3) Şîngil (1/2), Pandêrek (perçak);.gundêd wî li Tirkiyê ev in : Qoca, Çarçû, Sabqanlî, Gunaş (bi Ḧec Hesen ve), Boẍazkoy. Şayînî diyarkirinê ye ku Fayîq Aẍa pirr bi bin dênan ketiye û rewşa wî ya diravî zehmet bûye.

nakokiya berjewendiyêd wan bi carekê ne xweş in. Pirreka ji malbata Şêx Îsmayîl Zade li Helebê rûniştine. Mala Hec Omer, mala serekêd kevin ku niha kes jê ne maye, li ciyê wê Mihemed Doran Axa li Dêrsiwanê rûniştiye (niha li Hemê di rûniştina zorane de ye). Mala Melhem Zade û Mûrad Axa li Qernebî li Tirkiyê rûniştine.

## 4- ŞÊXAN

Erdêd Şêxan li navbera Biyan û Amkan li rohilat û êd Cûmê li başûr dikevin. Sînorê Tirkan erdêd Şêxan ji roava ve û ji bakur de tîş dike.

Hoz 12 000 kes heye, dora 75 gundêd wan hene. Herêma wan pirr rij e, hinek çandinî, xudankirina miyan û bizina û çêkirina komirê tê de dibe.

**Gund :**

Reco, Hec Xelîl, Maseka, Hopka, 'Etmana, Hecîka, Mûskê, Hesen Gulkewê, Dêrwîş, Qodako [1], Omer Oşaxî, Mamila, Kumreşê, Kurrê, Şediya,

1 Qudo (?) - wergêr.

Çeqela Jêrin, Çeqela Jorin, Mistika, Erendê, Şiyê, Senarê, Qermîtliq, Sorkê, Kala, Hec Bilêl, Kurka Jorin, Kurka Jêrin, Dumiliya, B'edîna [1], Hemşeleka, Şêx Bela [2], Kûra, Holîlo, Çençelya, Çeqmaqa, Huca Mala, Heyder Obasî, Cela, Belalîko, Ferêrê, Qere Baba, Telkeşûr, Salcek, Badanlî, Goliya, Çarhîtlî, Hecemanlî, Kûsa, Pandêrek, Şengal, Edema, 'Elbîskê, Geliyê Meydana (7 gund in : Gewenda, Waleklî, Sêmalka, Kurrê, Gazê, Şêx Mihemed, Dodo).

Li Tirkiyê (Kurdistan) : Gumît, 'Encara, Telbîr, Xerab Camûs.

**Dîrok :**

Koka hozê ji Şêxan êd Qerec Daxê (nêzîkî Wêranşehrê) ne. Ra niha hên perçak koçerêd Şêxan ji vê hozê di navbera Êfrîn û deşta Sirûcê de diçin û tên. Em tiştekî li ser vê hozê li Çiyayê Kurmênc nizanin.

Dora sala1852, Şêxan di şerekî de zora Biyan birin. Di wê demê de, du mala li ser mesela serdariya hozê bi hev re keti bûn berberiyê : mala Cefar û mala Reş Axa. Paşê, ê dudiyê vexwar.

---

1 Navê ev 7 gundêd dawiyê di *StudiaKurdica* de belav ne bûne.
2 Bilo ? - wergêr.

**Xanedanêd navser :**

Mala Reş Aẍa : cîgirê wan Ḧusên 'Ewnî, nayîbê kevin li perlemana Sûriyê, pirraniya erdêd wî li Tirkiyê ne [1], zanava [2] Tirkî jî stand dema ku Tirkiyê Sencaqa Iskenderonê bi xwe ve xistî; mala Cafer : Eḧmed Aẍa li Mamilan ku bi Ḧusên 'Ewnî re ne xweş in; mala Belê Reşê : Ḧeyder Aẍa li Kumreşê; mala Mûsayîn : Mûsa Aẍa li Maseka û Miḧemed Silêman li Hec Xelîl (bi Ḧusên 'Ewnî re ne xweş in); mala Kor Eḧmed : Ezet Aẍa li B'edîna, mala Duwîk : Mecîd Aẍa li 'Etmana, mala Muqdêd : Bekir Aẍa li Qere Baba; mala Alsoro, an mala Şînê : ji malbata aẍayêd Meydana ne, du bira ji vê malbatê, Xelîl û Mûsa, ji hev ẍeyidîn. Xelîl çûye aliyê Murûda û Mûsa çûye aliyê dijminê wan. Paşê, Mûsa ji aliyê dijminêd xwe de sala 1937 hate kuştin.

## 5- CÛMIYAN

Erdêd Cûmiyan ji rohilat-bakur ve dirêj dibin ra derdorêd Ezazê, ji başûr ve, perçak ji Çiyayê

1 Gumît, Encarlê, Yalanqozê, Şerşef, Mala Silêman (her sê gundêd dawî ne Şêxî ne).
2 Zanav : cinsiyet, hewiyet.

Sem'an digre. Bakurêd wan erdêd Şikaka, Amkan û Şêxan in, li roava sînorê Tirkiyê ye.

Peyva "Cûm" ji şêniyê ku li Geliyê Êfrîn rûniştî re tê gotin, hên berî ku di warê siyasî de bibe şêniyekî nas kirî [1]. Her çend komêd gundêd Cûmê diyar e berê şaẍina serbixwe jê çê bûbûn (Heştiyan, Xerzan, Xastiyan, Rûbariyan û gundêd Êzdiya) û êd mayîn ji hozê kok ne li ser hev in, belav in.

Gava em bingehê civakî yê Cûmiya dixwînin, nakokiya ku ra roja îro li hin perçêd Kurdistanê di navbera komêd xanedan (eşîret) û şêniyê gelemper (rayîyet) de heye, tîne bîra me.

## 6- RÛBARIYAN

Ev şaẍ ku sînorêd wê yêd erdnasî pirr ne diyar bûn gundêd di bin bandûra malbata Rûbariya de digre.

---

1 Peyva "Cûm" ji kevin de navekî erdnasî ye, ji Efrîna navîn re tê gotin. ("Cûm" bi kurdî "kort" tê. Wateyêd xwe yêd dinê jî hene. Cûm kirin : roxandin, kavil kirin, bi xar de xistin. Cûm bûn : kavil bûn, bi xar de çûn. Ji xwe Cûm beramberî çiya kort e, bi erdê de çûye - wergêr).

**Gund :**

'Enabê, Celbûr, Basilê, Ibînê, Xirêbe, Aqîbê, Çetel Zaretê, Xaledî, Dêr Mişmişê, Soyanek [1], Burc Hêderê, Zoq el Kebîr, Meyasê, Zanarît, Cûmek, Şêx Sayîdî, Kersantaş [2], Kefer Betan, Bênê, Cilbirê.

**Xanedan :**

Mala Rûbarî : Mihemed Rûbarî û pismamêd wî Erif li Kersantaşê û Mustefa li Bênê, mala Şêx Qasim Axa : Ezet Axa li Cilbirê.

**Gundêd Êzdiyan [3] :**

Qîbarê, Turindê, Cidêdê, Basûtê, Kîmarê, Feqîra, Kefer Zîtê, Bircê (Evdalo), Xezîwê, Beratê, Şadêrê, Îska, Bi'iyê, Basfanê, Kibêşînê, Fafertînê, Keferşînê, Başemirê, Gundê Mezin, Burc Qas.

1 Suwênekê ? - wergêr.
2 Kersanê - wergêr.
3 Navêd gundêd ku bin wan xêz kirî ne seranser, an perçak jê Ezdî ne. Gundêd dinê li dawî yê Musulman bûne. Ji van gundan, em navêd gundina Ezdiyêd Şikaka hewal din : Qitmê, Sînka, Baflûnê (heya roja îro gund tev Ezdî ye), Qestelê.

Pirraniya van gundan di bin destêd serokêd Rûbariya de bûn gava ȩvêd dawî hên li ser xwe bûn. Divê em hewaldin ku Êzdiyêd Çiyayê Sem'an xwestin xuya kin ku wan ji kevin de şaẍekî taybet, jê re dibêjin Şêrewî, çê kirine.

**Xanedan :**

Cemîl Aẍa serekê Êzdiya (li Qîbarê) û apê wî Omer Aẍa.

## 7- XERZAN

**Gund :**

Gundek, Xerza, Qujûma, Çolaqa, Aşka Şerqî.
**Xanedan** : Xelîl Aẍa.

## 8- ḦEŞTIYAN

**Gund :**

Coqê, Maratê, Xelnêrê, Dargirê, Gewrika, Kefer Delê, Çolaqa, Aşka, Kefer Şefrê, Kora, Gorda, Xalta, Miskê, Gazê, Buyuk Oba, Ẍazî Tepe.

**Xanedan :**

Xelîl Aẍa û Şeydo Mamo (geh li Miskê, geh li Êfrîn rûniştiye), Ḧesen Efendî li Gazê, tu bandûra wî nîne, Qûdûr Aẍa li Kefer Delê, Ḧesen Qewas li Gewrika, Miḧemed Nûrî Paşa (mala Safûya, berê xurt bûn, niha yek ne maye) li Maratê.

## 9- XASTIYAN

**Gund :**

Kaxurê, Mîrka, Birînce, Rûta, Şîtka, M'eriskê, Xaziya Jorin, Xaziya Jêrin, Rehmaniyê [1], Dela, Misto Axur.

**Xanedan :**

Ḧemîd Aẍa (mala Filekas) li Birînce, Silêman Aẍa (mala Ḧusên Ḧemtat) li Mîrka [2], Ḧec Reşîd Aẍa (ji Biyan) hinek erdêd wî yêd dinê jî li nav Xastiyan hene .

**Gundêd dinê :**

Kefer Mizê, Qere Tepe, Celemê, Til silorê, Dêwa, Dêr Belûtê, Xelîla, Terbêlan, Nesriyê, Ḧec Iskender, Alcê, Cindrêsê, Yalanqozê, Rif'etyê, Amelek, Ḧecîlerê, Ebû K'ebê, Firêriyê, Zelaqê,

1 Ji Reḧmaniyê re Şeytana jî dibêjin, tewrî her du nav bi wateyêd xwe ve tersî hev in ! - wergêr.
2 Navê vê malê li Mîrka jî bûye. Tê gotin Ḧemtato û Ḧemtata jî.

Kokebê, Tilifê, Til Hemo, Kanî Gewrkê, Qurbê, Qîlê, Sendiyan, Zêdiyê, Bablîtê.

**Xanedan :**

Mala Genc sê şax in : Ehmed Axa ku kurê wî li Hemamê bi zanavê Tirkî ye, Rif'et Axa (mala Omer) li Firêriyê û Elî Mustefa Axa (mala Betal Axa li Celemê). Mala Genc li Tirkiyê ne, hineka ji wan cîna girîng di îdareta Hetay de girtine. Hejmareka ne xirab ji wan li Helebê ne. Mihemed Axa (mala Ezdînê Şeref, parek jê Ezdî ne) li Şadêrê [1] , Sem'an Axa

1 Di warê Êzdiyêd ku Rojê Lesko dibêje de her yek ji derekê hatiye diyar e rast e. Li gor ku Ehmedê Nasirê Şemê ji gundê Şadêrê ji me re gotî, berê Şadêr giş Ezdî bûn, ji bavekî hatî bûn. Ji eşîra Xalta, ji Amedê hatine. Eşîra Xalta 45 000 mal hebûn, serekê wan Şêx Mîrzayê Anqos bû. Piştî ku malek ji hozê hat li Cûmê rûnişt, yek ji kurê 'Idê Şêref, navê wî Mihemed, milîsî ji Firansiza re kir. Hîngê Mihemed Kurdêd Musulman nas dike û Musulman dibe û malêd jê ve nêzîk jî bi xwe re Musulman dike. Şadêrê, berê, tev mîna hev bûn, axa tê de tune bûn û niha jî tê de tune ne. Wekî dinê, Mihemed bi milîstiya xwe, mîna caşêd îro, dikare destê zorê bide ser Şadêriyêd ku çav mîna wî ne vekirî bûn û nizanîn biçûna hukmetê bi erebî bipeyivîna. Bi vî awayî, Mihemedê ku tu malê xwe yî pirr tune bû, bi milîstiyê, salekê, mûsima gundiya hemî bi zorê û bi xapan dixwe û pê avahiyekê digre. Pê re, dubareyekê tîne serê mala Usoyê Eliyê Şêxkê, û bi dayîna jinekê erdêd wan hemî li ser xwe nav dike, ji xwe re dibe, xwe pê zengîn dike. Loma, carina jê re dibêjin "Axa". Piştî derketina Firansizan ji Sûriyê, ji mala Şemê, Ezdîn û Omer pirr kur çê dibin û çerxa Mihemed dişkê. Edî gundî ji bin destê wî

(mala Erebê Gûdê) li Cindrêsê, Emarê Ebas li Baflûnê.

**Dîrok :**

Wekî me li jor gotî, Cûmî şêniyekî ku giştik hevdî na girin, ji pirr hozan hatine, gundîna ji mêj de li herêmê rûniştine; koka wan yan ji Ezdiyêd herêmê, yan ji pirr hozêd rengreng de (wekî Xaletî, Şerqiya, Denadî, Dawûdî, Qopan, Reşwan) hatiye. Ji gelek perçêd dinê êd Kurdistanê reviyane û penaber bûne, an cihê cihê hatine, an bi kom hatine (Xerzan, ji navça Xerzan, an Xersa hatine). Ra sedê XVII, darê hukum di destê Ezdiyan de bû, paşê berebere hukmê wan pûç bû. Sedema vê yekê du tişt in : yek, şerêd di navbera wan de; dudu, ji olê xwe der ketine û bûne Musulman [1].

Li sala 1030 koçerî (sedê XVII), Kurdekî ji şaxê Rûbariyan ji hoza Berwariyan ku cîgehêd mezin li Istembûlê girti bû, şandine Kilisê ku fermandarê

---

der dikevin. Li şona wî, niha nixuriyê wî bi rolê wî yê berê radibe - wergêr.

1 Roger Lescot, "Enquête sur les Yézidis de Syrie et de Djebel Sindjâr" (Lêkolînek li ser Ezdiyêd Sûriyê û Çiyayê Şengalê) binêre. Berê, Serekêd Ezdiya ji van her du malêd yek kok der diketin : Evdalî li Burcê (Evdalo) û Baqûbî li Xezîwiyê (li vê paşiyê, li sedê XIX bûne Musulman). Ji mala serekêd niha mala Şemê ye ku îro giraniyeka xwe hene.



INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Çiyayê Kurmênc be. Neviyêd wî lingêd xwe li navçê bi cî kirin, li Kela Basûtê rûniştin û darê ḧukum li temamiya Cûmê xistine destêd xwe. Paşî wê bi sedekî (1150 koçerî), nûhatiyêd Tirk, mala Genc, ew ji ser ḧukum avêtin. Tevî ku çend caran wan xwestin ji nûv re ḧukmê xwe vegerînin, lê nikarîn û rolekî wan î sivik ma. Genc bi serê xwe man û ra 1230 koçerî (dora 1820) ḧukum kirin, sala ku Tirkan Betal Aẍa di Kela Basûtê de dorpêç kir. Ê dawî xwe spart û hate kuştin, paşê.

## X- ENDÊKS


Alcê 67
Alciya 53; 55
Alçolaq; 58
Alsoro 62
Alûs Axa 57
Amelek 67
Amkan 17; 19; 22; 24; 53; 55; 56; 57; 58; 59; 60; 63
Aşka 66
Aşka Şerqî 65
Aqîbê 64
Arslan Axa 57
Astêr 54; 55
B'edîna 61; 62
Bablîtê 23; 68
Badanlî 61
Baflûnê 69
Balî 58
Balkan 49
Balûrsangê 28; 53
Başemirê 64
Barkas 56
Basfanê 64
Basilê 64
Basûtê 64
Baxçe Konak 58
Beha el-Dîn Neqişbend 29
Behîc Beg 47
Bekira 58
Bekir Axa 57; 62
Bekir Efendî 41
Bekobasî 47; 59
Belalîko 33; 44; 61
Belê Reşê 62
Bêlê 56; 57
Bênê 64
Beratê 64
Bêrûtê 40
Berwariya 17; 69
Betal Axayê Gênc 18; 68; 70
Bi'iyê 64

Bîbaka 56
Bilbilê 58; 59
Bilêlko 45
Bircê (Evdalo 64
Bîrecikê 16; 40; 42
Birînce 67
Biyan 16; 17; 19; 21; 22; 24; 46; 53; 54; 55; 56; 57; 58; 60; 61; 67
Borca 28
Bûkê 58
Bûlamac 58
Burc Ḧêderê 64
Burc Qas 64
Bûxara 29
Buyuk Oba 66
Cafer 21; 61; 62
Çarçilê 58
Çarhîtlî 61
*Cebel el-Ekrad* 13
Cela 61
Celbûr 64
Celemê 67; 68
Celûs 54; 55
Çema 53
Çemê Efrîn 14
Cemîl Aẍa 65
Cemîl Eḧmed 55
Çençelya 61
Çeqela Jêrin 60
Çeqela Jorin 60; 61
Çeqmaqa 61
Çetelê 55
Çetel Koy 57
Çetel Záretê 64
Cidêdê 64
Cilbirê 64
Cindrêsê 67; 69
Çînê 30
Çiyayê Sem'an 62; 65
Çolaqa 65; 66
Coqê 66
Cûm, Cûmiyan 16; 17; 19; 20; 26; 53; 55; 60; 62; 63; 69; 70
Cûmek 64
Dargirê 66
Dawûdî 16; 69
Dela 67
Deli Xelîl 58; 59
Delî Osman 58
Denadî 69
Deşta Ezazê 13
Deraqliya 54
Dêrsimê 16; 56
Dêrsiwanê 53; 60
Dêrwîş 60
Dêr Belûtê 67

Dêr Mişmişê 64
Dêwa 67
Dîkê 56
Dîko 21; 57
Dodo 61
Dumiliya 61
Dûşar Oẍlu 57
Duwîk 62
Ebûdanê 58
Ebû K'ebê 67
Edema 61
Ẹdenê 58
Ẹfrîn 13; 16; 38; 47; 61; 66
Eḧmed Aẍa 55; 57; 62; 68
Eḧmed Men'an 55
Eḧmedê Rûto 57
Elbîskê 61
Eliyanlî 58
Elî Aẍa 57
Elî Bazan 53
Elî Begê 58
Elî Kera 58
Elî Mustefa Aẍa 68
Elî Ẍalêb 29; 38; 44; 45
Elkê 54
Emara 54
Emarê Ebas 69
Embara 57
Emera 56
Emperetoriya Osmanî 30
Enabê 64
Encara 61
Eşûnê 55
Epila 56
Ereban, Ereb 15; 22; 23; 26; 31
Erebê Gûdê 69
Erebê Kerê 56
Ereb Wêranê 53
Erendê 60; 61
Erif 64
Ermeniya 40; 42
Etmana 60; 62
Etmankan 16
Ewrupa 49
Ezazê 22; 23; 47; 53; 62
Ezdînê Şeref 68
Ẹzet Aẍa 62; 64
Ẹzdiyan 16; 17; 19; 47; 63; 64; 65; 68; 69
Fafertînê 64
Fayîq Aẍa 28; 38; 45; 55; 59

Feqîra 64
Ferêrê 61
Filekas 67
Firansa 49
Firansizan, Firansizî 19; 23; 37; 39; 40; 41; 43; 47; 50
Firêriyê 67; 68
Gawir Daẍê 58
Gazê 61; 66
Geliyê Çûmê 57
Geliyê Efrîn 13; 18; 63
Geliyê Meydana 37; 61
Geliyê Qereso 13
Gemrûkê 55
Genc 18; 21; 68; 70
Gewenda 61
Gewrika 66
Gobeka 54
Gola 56
Gola Wanê 16; 54
Golbaşî 58
Goliya 61
Gorda 66
Gumît 61
Gundek 65
Gundê Mezin 64
Hesar 58
Hetay 41; 68
Heyama 58
Hindistanê 30
Holîlo 61
Hopka 60
Ḧebeş 57
Ḧecemanlî 61
Ḧecîka 60
Ḧecîlerê 67
Ḧec Bilêl 61
Ḧec Ḧenan 59
Ḧec Iskender 67
Ḧec Omerê 21
Ḧec Omer 58; 59; 60
Ḧec Reşîd 59
Ḧec Reşîd Aẍa 55; 57; 59; 67
Ḧec Xelîl 60; 62
Ḧelebê 15; 38; 39; 42; 45; 46; 47; 59; 60; 68
Ḧemamê 68
Ḧemê 60
Ḧemîd Aẍa 67
Ḧemşeleka 61
Ḧenan Aẍa 57
Ḧenîf 29
Ḧeştiyan 63
Ḧesendêra 55
Ḧesen 57

Ḧesen Efendî 66
Ḧesen Gulkewê 60
Ḧesen Qewas 66
Ḧeyder Aẍa 62
Ḧeyder Beg 41
Ḧeyder Obasî 61
Ḧuca Mala 61
*Ḧukmeta Netewî* 47
Ḧusên 'Ewnî 22; 33; 37; 43; 45; 62
Ḧusên Ḧemtat 67
Ibînê 64
Imer 56
Imer Oẍlu 57
Îbrahîm Xelîl 28; 29; 31; 32; 34; 35; 36; 37; 38; 39; 40; 41; 43; 45; 46; 47; 48; 50; 51
Îbrahîm Xelîl 49
Îbrahîm Xelîl Aẍa 55
Îbrahîm Xelîl Sûk Oẍlu 28
îcazê 30
Îkeda 53; 58
Îska 64
Iskenderonê 62
Îslaḧiyê 28; 40; 42
Îslam 24; 31; 56
Istembûlê 69
Îzedîn 17
Îzmîtê 28
Jaro 58
Kalankex 55
Kala 61
Kanî Gewrkê 68
Kaxurê 67
Keferîm 55
Keferşînê 64
Kefer Betan 64
Kefer Delê 66
Kefer Mizê 54; 67
Kefer Romê 54
Kefer Sefrê 66
Kefer Zîtê 64
Kela Basûtê 18; 70
Kela Bedredîn 56
Kemalîstan 41
Kernebê 41
Kersantaşê 64
Kibêşînê 64
Kilisê 13; 16; 17; 42; 58; 69
Kîmarê 64
Kokebê 68
Kora 66
Kortikê 54; 55
Kor Eḧmed 62
Kor Reşîd 19; 37; 45


KURDISTANA
Bakur
Bakur
KURDISTANA BAKUR
KURDISTANA HIKUMETÊ
CEBEL
BIYAN
AMKAN
ŞIKAK
XASTIYAN
HEŞTIYAN
XERZAN
ROBARIYA
Meydan Ekbesê
Kûsa
Şingilê
Bûkê
Elî kera
Bilbilê
Geliyê Meydana
Heyama
Ebûdanê
Edema
Şêx Orzê
Zeytûnekê
Bilêlko
Cela
Dêrsiwanê
Balûrsngê
Kotana
G. Dîkê
Xilalka
Erebwêranê
Bêlê
Holilo
Reco
Hec Xelil
Hesendêre
Naza
Omera
Çema
Deraqliya
Destel
Şera
Kefer Cenê
Qilmê
Ezaz
Çeqela
Mistika
Xazîyê Jo.
Xazîyê Jê.
Mirka
Dargirê
Astêr
Dere depe
Qibarê
Efrîn
Şiyê
Şitka
Kaxurê
Gazê
Maratê
Gewrika
Turindê
Dêr Mişmişê
Cebûr
Senarê
Kurzêlê
Kora
Keferdelê
Feqîra
Merwaniyê
Kefer Sefrê
Aşka R
Soxonekê
Basûtê
Miskê
Tilifê
Kimarê
Kefer Zitê
Firêrê
Birc Evdalo
Aşka Roava
Cindrêsê
Xeziwê
Şadêrê
Hec Îskener
Çemê Efrîn
Îska
Nesriyê
Til Silorê
Celemê
Dêr Belûtê
Mile Xelila
HOZÊN ÇIYAYÊ KURMÊNC
Li gor nexşa Kaptên Daniau
Sînor
Rêya hêsin
KURDÎKIRINA NEXŞE: AMED

Mûsayîn 62
Mûsa Axa 62
Mûsilê 40
Mûskê 60
Mustefa 64
Musulman 69
Naza 54
Neqişbendiyan 23; 29; 30; 32; 41; 42; 51
Nesriyê 67
Niyazî Uz Alp 42
Ocaq 'Izedîn 57
Oganlî 58
Omera 53
Omer 53; 68; 60
Omer Axa 65
Omer Simo 58
Oşaxî 60
Orta 56
Osmaniya 17; 28
Pandêrek 61
Paşa Baber 30
*Parastina Gelempera Enqerê* 42
*Parastina Nihênîya Tirkan* 40
Pêrteklî 58
Qadiriyan 23; 30
Qaşa 56
Qartîn 56
Qaybaşiyê 58
Qazeqlî 58
Qere Baba 61; 62
Qere Coran 54
Qerec Daxê 61
Qere Tepe 67
Qermîtliq 56; 60; 61
Qernebî 58; 60
Qestelê 47; 54
Qîbarê 64; 65
Qîlê 68
Qiriq Xanê 42
Qitmê 54; 55
Qizilbaşa 56; 57
Qodako 60
Qopan 69
Qoqazê 29; 31
Qûdûr Axa 66
Qujûma 65
Qumurlî 58
Quranê 31
Qurbê 68
Qurnê 58
Reço 13; 60
Rehmaniyê 67
Reşîd 45; 57
Reş Axa 21; 61; 62

Reşîdê Îbo 33; 34; 39; 45
Reşwanan 16; 58; 69
Rif'etyê 67
Rif'et Axa 68
Rifa'îyan 23
Rohilat 31; 32
Rohilata Dûr a Musulmanî 30
*Rohilat Express* 38
Rohilata Nêzîk 30
Rûbariyan 18; 21; 63; 64; 65; 69
Rûsa 31
Rûta 67
S'erîncekê 53; 55
Sabqanlî 58
Safûya 66
Salcek 61
Satlî 58
Saxîr Obasî 55
Se'îdê Mamo 21
Sêcerazê 55
Sem'an Axa 68
Sêmalka 56; 61
Senarê 60; 61
Sencaqê 41; 43
Sendiyan 68
Seydê Dîko 43
Seydo 57
Seydo Dodeko 48
Seydo Mamo 66
Silêmaniyê 30
Silêman 57
Silêman Axa 67
Simo 53
Sînka 53
Sirûcê 61
Solaqlî 58
Sorkê 60; 61
Soyanek 64
Sulêmanê Gewre 17
Sultan Selîmê Yekê 17
Sunî 31; 56
Sûriyê 13; 16; 17; 24; 28; 29; 30; 37; 38; 39; 42; 43; 44; 45; 46; 47; 48; 49; 50; 51; 54; 62
Şadêrê 64; 68
Şamê 23; 30; 45; 46
Şamîl 29; 31
Şediya 60
Şengal 61
Şera 53; 54; 55
Şerefiya 32
*Şerefname* 16
Şêrewî 65
Şerqanlî 58

Şerqiyan 16; 69
Şêxan 16; 17; 19; 20; 21; 22; 24; 55; 56; 57; 58; 60; 61; 63
Şêxo Aẍa 38; 55; 59
Şêx Bela 61
Şêx Eḧmed Lameh 23
Şêx Evdilreḧman 23
Şêx Ḧenîf 32; 37; 44; 45; 47
Şêx Îs 55
Şêx Îsmayîl Zade 21; 22; 24; 29; 34; 38; 46; 54; 59; 60
Şêx Îzedîn 17
Şêx Miḧemed 61
Şêx Orozê 44; 47; 58
Şêx Qasim Aẍa 64
Şêx Sayîdî 64
Şêx Xalid 30
Şî'î 56
Şikakan 16; 17; 19; 22; 24; 53; 54; 55; 57; 58; 59; 63
Şînê 62
Şîtka 67
Şiyê 57; 60; 61
Şorbe 56
Şorbe Oẍlu 57
Tasbîh 58
Telbîr 61
Telkeşûr 61
Tenûr 58
Terbêlan 67
Teyfûr Beg 41
Tilifê 68
Til Ḧemo 68
Til silorê 67
Tirkiyê, Tirk, 15; 18; 23; 28; 29; 30; 36; 39; 40; 41; 42; 43; 44; 45; 47; 48; 49; 51; 57; 58; 60; 61; 62; 63; 68; 70
Torosê 13
Turindê 64
Waleklî 61
Wehabiyan 31
Wêranşehrê 61
Xaledî 64
Xaletî 69
Xalitan 16; 66
Xastiyan 63; 67
Xay Oẍlu 58
Xaziya Jêrin 67
Xaziya Jorin 67
Xelîl 37
Xelîla 67
Xelîleka 56

Xelîl 62
Xelîl Axa 57; 65; 66
Xelnêrê 66
Xerab Camûs 61
Xersa 69
Xerzan 63; 65; 69
Xesa 41
Xidiriya 58
Xirabî Şera 53
Xirêbe 64
Ẍazî Tepe 66
Ẍezîwê 64
Yalanqozê 67
Zanarît 64
Zara 58
Zareta Şêx Orozê 28
Zêdiyê 68
Zelaqê 67
Zerka 55
Zeytûnekê 47; 53; 58
Zoq el Kebîr 64



## ROGER LESCOT

"Roger Lescot yek ji wan dostan bû ku wî di warê nasandina çanda Kurdî de bi wergerandinên xwe yên sipehî xebateke giranbiha kiriye. Di sala 1936'an de gava ew li Parîsê xwendina xwe temam dike, hukûmeta Fransa wî disîne Enstîtuya Fransiz a Şamê. Li Şamê ew rastî Celadet Bedirxan tê, dostaniyeke wî ya mezin çê dibe.

Roger Lescot giraniya xebata xwe ya zanistî dide ser Kurdan; Kurdî hîn dibe, çîrok, metelok û efsaneyên Kurdî berev dike, li ser jiyana Kurdan ya civakî, li ser ola Êzidiyan lêkolînan dike. Hin beş ji vê xebata wî ya destpêkê di kovara **Hawarê** de di bin navê "Tawusparêzî" bi Kurdî û bi Fransizî derdikevin.

Roger Lescot di nav Kurdên Sûriyê de hewqas dihat naskirin û hizkirin ku kesî bi navê wî yê Fransizî gazî nedikirê; navekî Kurdî lêkiribûn: Ew Lezgîn Axa bû.

Di sala 1938'an de pirtûka wî ya pêşî ya li ser Kurda dertê. Ew li ser Êzidiyên Sûrîyê û Sincarê ye.

Di Kanûna 1945'an de Roger Lescot li Zanîngeha Sarbonê kursiya zimanê Kurdî saz dike û li wir salekê dersên zimanê Kurdî dide, heta ku Kamûran Bedirxan ji Beyrûtê were dewsa wî bigre.

Gava ku nexweşiyeke bêderman Lezgîn Axa di sibata 1975'an de ji nava me bir, ew hê 61 salî bû"